



Danerê Rojnameya pêşî a Kurdî  
Miqdad Mûhed Bedirxan

# Armanç

Hejmar, No: 140  
Tîrmeh  
July 1993  
Buha - Price  
15 SKR, 3DM

Rojnameya Mehane

◆ Li Sêwasê 37 kes hatin şewitandin, li Erzîncanê 28 kes hatin gullebarankirin û li Wanê jî 26 koçer -piraniya wan zarok û jin bûn bi ser hev de hatin kuştin.


◆ Li ser navê çî û ji aliyê kê ve, tê kirin bila bê kirin, kuştina kesên sivil nayê teswîpkirin û divê ev bûyerên wiha bên rûşekirin.

Pişti bûyera Çewlikê, teqerawestandina di navbera PKK'ê û Dewletê de xerab bû û di navbera hêzên dewletê û PKK'ê de şerekî dijwar dest pê kir. Herroj bi dehan leşker, gerilayên PKK'ê û kesên sivil di vî şerî de tên kuştin. Netîca vî şerî gundiyên Kurd mecbûr dibin dev ji axa xwe, gundê xwe û warê bavûkalê xwe berdin û berê xwe bidin bajaran û yên bajarên Kurdistanê jî berê xwe bidin Anadolîyê.

Him dewlet û him jî PKK beyan derdixin ku hin bajar bûne qada şer û lazim e gel van bajaran vala bikin. Li gor beyana Mebûsê DEP'ê Ahmed Turk di van du mehên dawîn de 80 gund bi temamî hatine valakirin.

## Qetliamên Sêwasê, Erzîncanê û Wanê

Di 2'ê Tîrmehê de li Sêwasê qetlameke mezin çêbû. Kesên paşverû, fanatik û yên duzana şerîatê dixwazin Otela Madimakê dan ber agir û 37 nivîskar, hunermend û hozanên pêşverû hatin şewitandin.



Li gor agahdariyan di 1'ê Tîrmehê de li Sêwasê şahiya Pîr Sultan Ebdal çêdibe. Gelek nivîskar, hozan û hunermendên pêşverû û demokrat bêşdarî şahiyê dibin. Di nav van kesan de

nivîskarê Tirk Azîz Nesîn jî heye. Şahî bi serfirazî derbas dibe. Rojêk piştî vî şahiyê fanatik û paşverûyên Sêwasê ji nimêja İniyê derdikevin kuçe û qolanan û êrişê dibin ser Otela Madimakê.

Di otelê de Azîz Nesîn û kesên ku beşdarî şahiya Pîr Sultan Ebdal bûne dimînin. Otelê didin ber agir 37 kes bi jîndarî di otelê de dişewitin û dimirin. Azîz Nesîn bi bêhemdî ji şewitandinê difilite

û ji destê fanatikan zor xelas dibe. Bûyer 8 seet dajo, lê polis û leşker tenê temaşeyê bûyerê dikin. Bûyera Sêwasê him bi pê-

Dûmahfk: r. 11

## Êrişên Îranê yên li ser Kurdistanê dom dikan

Netîceyên civînên sêqolî di pratîkê de xuya dikan. Îran dest ji êrişên xwe yên li ser Kurdistanê bernade. Di mehe Tîrmehê de êrişên nuh birin ser Kurdistanê.

Li gor agahdariyên berpirsyarê Kurdistanê Federe roja 22'yê Tîrmehê, di netîca êrişa ordiya Îranê dibistana gundê Karnaweh ku li herêma Şivarta dikeve hilweşiya. Gundê Karnaweh 15 km ji hudûdê Îranê dûr e.

Herweha li gor agahdariyên berpirsyarekî Komela, her wê rojê hêzên Îranê, meqerekî wan bombardûmankirîye.

Li ser van êrişan, berpirsyarên Kurdistanê Federe bi beyanên xwe dan diyarkirin ku ewê rê nedin Îranê ku

hakimiyeta xwe li ser herêma bike. Heger Îran êrişên xwe bidomîne ewê jî bê bersiv nehêlin.

Wezîrê dewletê yê berpirsyarê tîkiliyên İnsanî Muhamed Tevfîk di beyana xwe de qerardariya Kurdistanê Federe dubare kir û got: "Heger Îran bombakirî-nên xwe bidomîne, emê jî bi eynî şeweyê bersiv bidin".

Wusa xuya ye ku Îran wê êrişên xwe bodimîne. Di meha Tîrmehê de pêşmerge li ser erdê Kurdistanê Iraqê 4 leşkerên Îranî girtin. Îranê di

şûna ku uzrê xwe bixwaze, Kurdistanê Federe tehdît kir, got heger hun leşkerên me bernedin, emê bajarê Silêmaniyê bombardûman bikin.

Ev êrişên Îranê yek ji perçên plana helweşandina Kurdistanê federe ye ku dewletên mêtîngehkar dane ber xwe. Netîca hevduîtinên sêqolî (Îran, Tirkîyê û Suryê) ye.

Wek tê zanîn Îran ji serê salê vir ve ye êrişê Kurdistanê azad dikan. Bi bahana meqerên PDK-î û muxalefeta xwe bi dehan gundê Kurdistanê hilweşand.

GENAWIR-BABA



Rojava Mehê



**Di pirsas Kurdî de taktîkeke durû**

Dîroka pêşveçûna Tirkîyê nişan dide ku Tirk gava ber bi reformê de gav diavêjin, ne ji ber wê yekê ye ku bawerîya wan bi wê reformê tê, lê ji ber wê yekê ye ku di têkiliyên xwe de yên bi din-yaşê re mecbûr dibin loma vê gavê davêjin.

Di dewra dawîn a Împaratoriya Osmanî de jî wiha bû. Tevgerên reformîst yên wek "Osmaniyên Nuh", "Jon Turk" û yên din, xwe-dêgiravî li hemberî rejîma tarî ya Sultan Abdulhemîd, doza azadî û reforman dikirin, lê sedemên van daxwazên wan ew bûn ku digotin Abdulhemîd reforman nake, loma jî dewletên Rojava bahane dibînin ku destdirêjîya nav dewleta me bikin, divê em bixwe van reforman çêkin da nehêlin biyanî destên xwe dirêjî nav dewleta me bikin.

Tevgera Kemalîstan jî wiha bû, hilweşandina padişahî û xelîfetiye, avakirina cumhuriyete, derxistina qanûnên medenî, civakî û aborî ne ji ber ku bawerîya Kemal bi van gavan dihat, lê ji ber ku dewletên serdest ên Şerê Yekem ê Cihanê ev dixwestin, pêk hatin.

Îro jî gava hukumetên Tirk hin qanûnan berbi pêşveçûna demokrasiyê derdixin yan jî behsa qebûl-kirina realîta Kurdan û day-ina hin mafên kulturî dikin ji ber wê yekê ye ku dix-wazîn di Civaka Ewrûpayê de bi cî bibin, têkiliyên xwe yên aborî û civakî bi Rojava re xurt bikin, nehê-lin kes karibe karta Kurdî li hemberî wan bilîze û sergêjaniyê ji wan re çêke. Îro Tirk naxwazîn zêde li hundirê welêt serê wan biêşe. Çimkî derbe li abo-riya wan, li projeyên wan ên turizmê dikeve. Çimkî, îro dixwazîn bi hêzeka xurt li Balkan û bi taybetî li Kafkasyayê û Asya Navîn rola mezinahiyê bilîzin.

Ji ber vê rewşa xwe ya îroyîn Tirk di pirsas Kurdî de dualî diltzin. Ji aliyekî de, bawerîya wan bi dayina mafên azadî û milî yên Kurdan nayê, ji aliyê din jî rewşa navnetewî ya îroyîn, siyaseta wan a derva wan mecbûr dîke ku bi awakî xwe ji sergêjaniya pirsas Kurdî xelas bikin. Ev dualîti, loma jî di siyaseta wan a pirsas Kurdî de durûtiyê peyda dîke. Bi rastî jî bilî êrişên leşkerî, şer û kuştinê tu plan û projeyên wan ên çareserkirina pirsê nînin, lê bi peyv, her demê texterewaliyek tê listin. Di dewletê de hergav aliyek xwe dîke alîgirê çareserkirina pirsê ta dere- ceykê, aliyek jî ling dide erdê li hemberî çareserkirinek bi her awayî dertê. Bi vê leyistika texterewaliyê û bi îdîa "terorîzma PKK"ê hukumetên Tirk heta niha bi ser ketine ku li hember dewletên Rojava xwe masûm nişan bidin, bahane bibînin ku çima mesele nayê çareserkirin.

Taktîka dewleta Tirk di pirsas Kurdî de ev e. Heta jê tê dixwaze, sergêjaniya pirsas Kurdî li ser xwe sivik bike, hêzên navnetewî jî vê meselê bi dûr bixe û di siyaseta xwe ya derva de tesîra vê pirsê hindik bike. Heta îro, hukumetên Tirk di vê taktîkê de biserketine. Di biserketina wê de helbet valatî û bêserûberiyên tevgera Kurdî jî cîh digrin. Rewşa me, pencera bîhnvedan û jiyane dide vê taktîke. Heta ev taktîk qulikeke bîhnvedanê jî xwe re bibîne, wê bikaribe bijî û bi hemî durûtiya xwe li kar be.

Tevgera Kurdî divê gelek ciddî li ser vê yekê raweste ku ka wê çawa qulika bîhnvedan û jiyana vê taktîka durû li her derê cihanê jî îmkanê jiyane bepar bihêle.

**Ji ber vê rewşa xwe ya îroyîn Tirk di pirsas Kurdî de dualî diltzin. Ji aliyekî de, bawerîya wan bi dayina mafên azadî û milî yên Kurdan nayê, ji aliyê din jî rewşa navnetewî ya îroyîn, siyaseta wan a derva wan mecbûr dîke ku bi awakî xwe ji sergêjaniya pirsas Kurdî xelas bikin. Ev dualîti, loma jî di siyaseta wan a pirsas Kurdî de durûtiyê peyda dîke. Bi rastî jî bilî êrişên leşkerî, şer û kuştinê tu plan û projeyên wan ên çareserkirina pirsê nînin, lê bi peyv, her demê texterewaliyek tê listin. Di dewletê de hergav aliyek xwe dîke alîgirê çareserkirina pirsê ta dereceyê, aliyek jî ling dide erdê li hemberî çareserkirinek bi her awayî dertê.**

**Li Moskovayê "Navenda Lêkolînên Kurdî" ava bû**

Bi însiyatîf û piştgiya Dr. Seîde Mele û bazirganê Kurd Mizgîn Mêqerî, Navenda Lêkolînên Kurdî li Moskovayê hat damezirandin. Ji destpêka sala 1993'an ve kar jî vê Navendê re dibe û ji meha Adarê ve dest bi karê xwe kiriyê û di dawiya meha Hezîranê de tamam bûye û Navendê êdî bi resmî dest bi karê xwe kiriyê.

Armanca kesên însiyatîfan ev e ku xeta medresa Kurdnasiya Rûsî û Sovyetiya kevn û xurt dîsa were domandin. Ev zanyar û Kurdnasên bi nav û deng, wê kitêb û nivîsarên hêja li ser dîrok,

tore û zimanê Kurdî bicivînin, da bi vî rûhê nuh ku piştî belavbûna Yekîtiya Sovyetê peyda bûye û gelek nêrînen berê guherîne û gelek babetên ku berê qedexê û girtî bûn hatine vekirin li ser wan xebata xwe bikin.


Kadroyên Navenda Lêkolînên Kurdî ev in. Di warê dîrokê de; Prof. Şakirê X. Mixoyî(Endamê Akademiya Zanyariya Ermenîstanê), Prof. Mixayîl Lazarev, Prof. Manwel Hasretyan, Dr. Yevgeniya Vasilyêva, Dr. Olga Jîgalîna. Di warê Ziman û Toreyê Kurdî de, nivîskar Bavê Nazê, Dr. Zara Üsiv, Dr.

Rûslan Tsabûlov, Dr. Beşîr Sebrî û Silêmanê Alî dixebitîn.

Dîrokzanên Navendê dest det bi xebata kurtedîroka Kurdistanê(bi tevayî) jî demên kevn heya roja me dinivîsînin. Di warê ziman û toreyê de jî kadroyên Navendê dixwazîn pirtûkên dibistanan jî bo sinifên destpêkê û bilind, bi Kurmancî dîrok, grammer û toreya Kurdî amade bikin, nivîsarên dîrokzan jî Rûsî wergerînin Kurdî. Û her wisa Navend dixwaze pirtûka xwe ya salane (almanax) a giştî jî derxînin.

Silêman Alî

**Yekemîn Pûlê Kurdî**



Yekemîn pûlê Kurdî berî 70 salan jî aliyê Hikumeta Kurdistanê Başûr(Hikumeta Şêx Mehmûdê Berzencî) ve di meha Çiriya Pêşîn a sala 1923'an de hatiye derêxistin û di warê muamelên nava dewletê de wek pûlê malî (damga pulu) hatiye bikaranîn. Li gor malûmatên Tariq Cambaz ku di rojnama El-Îttihad (organa navendî ya YNK, bi erebî û

hefteyî, hejmar 29, 22-5-1993) de belav kirî 3 babet pûl li ser kaxezên rengîn derketine.

1-Buhayê Pûlê bi rengê kesk 8 ane (niv rûpî, yanî 32 quruş)

2- Buhayê Pûlê bi rengê şîn 1 rûpî

3-Buhayê Pûlê bi rengê mor qîmeta wî 3 rûpî


Li ser pûl "Hikûmetî Kurdistan Cenûbî" hatiye nivîsandin û di ortê de rismê 2 xencerên çapraz heye û di binî de jî "ane"hatiye nivîsandin.

Lê belê di vî pûlê ku di dest de qîmeta wî nehatiye nivîsandin û ciyê wê vala ye. Dîsa li gor gotina nivîskar, Hikûmeta Herêma Kurdistanê wê di demek nêzik de, di dîroka Kurdistanê de cara duduyan pûlê malî derbixe û ewê li ser pûl rismê Parlamentoya Kurdistanê hebe.

**Rastkirin**

Di hejmara Armancê ya 139'an de di meqala "Bi şablona li hember şablona têkoşîn nabe" de " Fabrikên berê li Kurdistanê yên ferdan bûn, dawiyê dewlet ew milî kirin.. hatiye nivîsandin. Wê rastiya wê wiha be: "...Fabrikên berê li Kurdistanê ne yên ferdan bûn, dewletê ew milî nekirin..."

Reşîd Burhan



**Fûad Qedri Cemil Wefat kir**

Fûad Qedri Cemil di 3'ê Hezîrana 1993'an de li Moskovayê çavên xwe li jiyane girtin û çû ser heqîya xwe.

Fûad Qedri kurê Qedri Cemil Paşa bû. Qedri Cemil Paşa di dîroka Kurdistanê de ciyek girîng distîne. Pirtûka wî ya "Doza Kurdistan" ku bi naznavê "Zinar Silopî" nivîsiye belgeyek hêja ya dîroka Kurdistanê ye.

Mala Cemil Paşa di sala 1935'an de tîs surgunkirin û ew li Sûriyê bi cih dibin.

Fûad Qedri di sala 1918'an de hatiye dinê û di nav xelkê de bi navê "Ebû Qedri" dihat naskirin. Fûad Qedri di navbera salên 1954-1958'an de li herêma Cizirê (Sûriyê) dibe mebûs û di parlamentoya Sûriyê de wek Sekreterê "Tecemûhil Qewmî" dixebite.

Fûad Qedri bavê 6 zarokan bû. Kurê wî yê mezin Qedri Cemil nuha endamê Komîta Merkezî ya Partiya Komunîst a Sûriyê ye û berpirsiyarê organa partiyê "Nidalî Şab" e.

**Armanc**  
Rojnama Kurdî ya mehane  
Monthly Kurdish Magazine  
**Redaksiyon:**  
M. Elî  
Hesen Mizgîn  
Mîrza Bextiyar  
Lewend Firat  
S. Rêving  
M. Lewendî

**Redaktorê berpirsiyar:**  
M. Elî  
**Berpirsiyarê beşê Dimilki:** Malmîsanîj

**Adres :**  
Box: 152 16  
161 15 Bromma  
Sweden  
**Telefon**  
46-8-803135  
**Telefax:**  
46-8-801825  
**Utges av:**  
Kurdîska  
Demokratiska  
Arbetarunionen  
Postgiro: 50 37 99-9  
ISSN: 0348 7385

**Abonetî**  
**Prenumeration**  
Abonetîya Salekê  
Li Skandinaviya  
200 SKR  
Maçam  
Myndigheter  
400 SKR  
Li Ewrûpa  
50 DM  
Li derveyî Ewrûpa  
40 \$  
**Anons/ilan**  
niv rûpel/ en halvsidan  
2500 SKR

## Îzeddîn Mustefa Resûl:

## "Xewna min bû rastî"

Îro li Hewlêrê, li Suleymaniyê û li Dihokê zaningehên bilind ava bûne. Zaningeha Suleymaniyê ji aliyê xelkê hatiye avakirin. Di Unîwersîteya Hewlêrê de gelek fakulte; wek Fakulteya Huqûqê, Fakulteya Tarîxê, Fakulteya Sosyolojiyê, Fakulteya Cografyayê, Fakulteya Matamatikê hene

Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Başûr, parlamenterê Meclîsa Herêma Kurdistanê û mamostê edebiyatê ya Unîwersîta Selehedîn Prof. Îzeddîn Mustefa Resûl di destpêka meha Tirmehê de hat Swêdê.

Îzeddîn Mustefa Resûl di 9'ê Tirmehê de li Stokholmê Buroya Armançê ziyaret kir û di derheqê Armançê de înformasyon stend û li ser rewşa Kurdistanê Başûr agahdarî dan.

Îzeddîn Mustefa Resûl di 10'ê Tirmehê de ji li Stokholmê seminerek da. Seminerê ji du beşan pêk hat. Bi tevayî rewşa rewşenbîrî û rewşa edebiyata Kurdî.

Îzeddîn Mustefa Resûl di beşa yekem de bi gelemperî li ser rewşa siyasî, aborî, kulturî û civakî ya Kurdistanê Başûr agahdarî dan û bi taybetî li ser karûbarê perwerde ya li Kurdistanê, sekinî. Îro di qada perwerdeya li Kurdistanê Başûr de 35656 kes kar dikin ku ji wan 18614 jin in. Problema herî mezin kaxiz û xubir e ku li gor Îzeddîn Mustefa Resûl ew wan tiştan ji bi kaçaxî ji Îranê û Tirkîyê bi dest dixin.

Îro li Hewlêrê, li Suleymaniyê û li Dihokê zaningehên bilind ava



Îzeddîn Mustefa Resûl:  
"Îro kuçe û kolanên Kurdistanê Başûr bi navê A. Xanî, Goran, Melayê Cizîrî bi navê şair û şehîdan û bi rismên wan hatine xemilandin (Foto: Armanç)

bûne. Zaningeha Suleymaniyê ji aliyê xelkê hatiye avakirin. Di Unîwersîteya Hewlêrê de gelek fakulte; wek Fakulteya Huqûqê, Fakulteya Tarîxê, Fakulteya Sosyolojiyê, Fakulteya Cografyayê, Fakulteya Matamatikê hene û pîraniyê van fakultan ji xwendekaran re vekirîne.

Li gor ku Îzeddîn M. Resûl digot, di mektebên Kurdistanê Başûr de kitêbên fenî (Kimya, Fizîk, Biyolojî, Matamatik) yê di dewra Seddam de hatine çapkirin bi kar tînin. Lê kitêbên edebî hukûmeta Kurdan bi xwe çap kirine.

Li Kurdistanê Iraqê rojnameyên rojane "Kurdistanî Nwe" û "Biryayî" hene. Kurdistanî Nwe ji aliyê YNK, Biryayî jî ji aliyê PDK-I tînin derxistin. Rojnameyên Hefteyî jî ev in: Herêma, Karwan (Kurdî), El Kafîle (Erebî), Xebat (Erebî), El-Îttîhad (Erebî).

Televîzyon û Radyoyên li Kurdistanê jî ev in: PDK-Iraqê li

Hewlêrê, li Suleymaniyê, li Dihokê weşanên televîzyon û radyoyê hene. YNK li Hewlêrê, li Suleymaniyê û Li Dihokê weşanên televîzyonê hene û li Hewlêrê weşana radyoyê dike. YEKGIRTIN li Dihokê, Suleymaniyê û li Hewlêrê bi navê YEKGIRTIN weşanên televîzyon û radyoyê hene. Li Hewlêrê û li Suleymaniyê televîzyona Partiya Zahmetkêşan hene.

Ajansa Wezareta Rewşenbîrî jî hatiye avakirin lê hîn qels e.

Îzeddîn Mustefa Resûl di axaftina xwe de digot "Îro kuçe û kolanên Kurdistanê Başûr bi navê A. Xanî, Goran, Melayê Cizîrî, bi navê şair û şehîdan û bi rismên wan hatine xemilandin. Erka hemû Kurdan e ku vê çepera iroyîn biparêzin."

Semînerê ji aliyê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê û Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê li Swêdê hat amadekirin û nêzî 350 kes di seminerek de beşdar bûn.

## Sekreterê Giştî yê PDK-Îranê Mustefa Hicrî:


## "Dewletên Ewropayê dixwazin mesela Kurdî di çerçewa dewletên ku Kurd lê dijîn bête çareserkin"

Di hefteya pêşîn a meha Hezîranê de Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê Mustefa Hicrî hat Swêdê. Ew li Swêdê bi berpirsiyarên Partiyên Swêdê re rûnişt.

Di 10'ê Hezîranê de Mustefa Hicrî buroya Armançê jî ziyaret kir û bi endamên redaksiyona me re sohbet kir.

Li ser pîrsa me ya ku çima raya giştî ya cihanê li hember têkoşina gelê Kurdistanê Îranê bê deng e, Mustefa Hicrî got ku: "Li Îranê çî radyo û çî jî rojnameyên giştî azad nînin, ku bikaribin nûçeyan belav bikin û ev bûye sedem ku li cihanê bi wî rengê qala tevgera milletê Kurd li Kurdistanê Îranê neyê kirin. Ji aliyê din jî vê meseleya Kurdistanê Iraqê û sistema nuh a hukûmetê bûye sebaba hinde ku bala raya giştî ya cihanê bi aliyê xwe ve bixşîne û bi wî awayî pîrsa Kurd li perçên din tê jibîrkirin."

Mustefa Hicrî li ser ziyareta xwe ya Ewropa û Amerîkayê jî wiha digot: "Yek ji armancên min di vê seredanê de ew bû ku peywendî bi berpirsiyarên hikûmetên welatên Rojava re deynim, ji wan re rewşa Kurdên li Kurdistanê Îranê ronî bikim û hinek ji wan welatan agahdar bikim ku, dîtîn û lênerînen wan li ser Cumhûriyeta Îslamî çewt bûn". Î Mustefa Hicrî wiha dom dikir: " Bi dîtina min, pîraniya wan welatan di pîrsa Kurdî de xwedî şehrezahî ne, ew dixwazin mesela Kurdî di çerçewa dewletên ku Kurd lê dijîn bête çareserkin. Welatên demokrat yê din yê bi giştî li dijî nînin ku, milletê Kurd li welatê xwe yê dabêşkirî xwediyê mafê çarenivîsa xwe be."



Sekreterê Giştî yê PDK-Îranê Mustefa Hicrî buroya Armançê jî ziyaret kir. (Foto Armanç)

## NEYNIK

## Hukumeta Nuh û "Programa Nuh"

M. Xelîl

Hukumeta Tansu Çiller saz bû û piştgirî ji parlamento girt. Serokwezîrê di peyva xwe ya li parlamento û ya di televîzyonê de, di çuna Çolemergê û gera bajarên Kurdistanê de xuya kir ku, ew dê bi awakî nuh biçe ser meselê û ew dê ji gel re "xwîşk û dê" be, ji ber wê jî çawa piştgirî ji parlamento û serokên partiyên girtibû, doza piştgirîya gel ji kir. Lê kiryar û rêveçûna wê dimeneke din derxist ber çavan.

Ew jî dê mîna hukûmet û serokwezîrê din, bi pêşniyar û biryarên Komîta Ewlekariya Neteweyî doza Kurdan "çareser" bike. Ji xwe ev awa ne nuh e, her hukûmet dema hatiye, li ser wê rêçê meşiyaye û roj bi roj doza gelê Kurd jî aloztir bûye. Ango bi navê alternatîfeke nuh, bê alternatîfiya Tansu Xanim xuya dibê. Ji ber wê jî piştî ku bi serokên partiyên parêzgerên sazûmana dewletê re li ser komîteyê hevbeş ya ku pêşniyaran pêşkêşî parlamento bike li hev kir, bi civîn û biryarên kadroyên mulkî, leşkerî û yê MÎT û İstixbarata leşkerî ji bo "çareserkirina" doza gelê Kurd li Kurdistanê Bakur biryar girtin û gavên nuh avêtin.

Êdî pîlan êşkere bûye. Ew dê bixwaze PKK ji gel tecrît bike û hêza wê ji hev bixe. Ji aliyê din jî bi piştgirîya partiyên din û yekdengîya parlamentoyê, dê riyê diplomatî û propagandayê bikar bîne. Bi wî awayî çî li Tirkîyê û çî li derve ji kiryarên xwe re piştgirîya peyda bike û biheqbûna xwe xuya bike ta ku bê bend û kosp bigihê amanca xwe. Tevî van tiştan dîsa heger doz çareser nebû û pîlan biserneket, îcar komîta hevbeş ya ji hemî partiyên pêkhatî dê bixwaze pîlanê duhem bide pêş. Çerçewa pîlanê ku komîta hevbeş dê pêşkêşî parlamento bike, dê ji çerçewa mafên ku bi peymanan Lozanê ji Cuhû, Suryanî, Ermenî û Rûman re ango ji gel û netewayên nemisilman re hatiye dan ne firehtir be. Xwedêgiravî ew dê bi wê jî doza gelê Kurd a Kurdistanê Bakur ku hejmara wî li dor 20 milyon e, "çareser" bike û civakeke lihevragirtî pêk bîne.

Belê kêm an pir çerçewa pîlan û programa Tansu Çiler ev e. İcar em vegerin aliyê din, gelo rewşa tevgera gelê Kurd li Kurdistanê Bakur çî ye û jî bo dema nêzik çî program li ber wan e?

Şerê ku PKK dest pê kiriye gihastiye kateke nuh û berpirsiyarên partiyê jî destpêka bihara vê salê ve dibêjin "havinê dê gelekî germ derbas bibê". Ew jî ji bo şerê bibe şerê man û nemanê hemî hêza xwe bi kar tînin û seferberî jî îlan kirine.

Belê çî jî aliyê dewletê û çî jî aliyê PKK'ê ve jî zûde biryar hatine girtin. Piştî wan biryara xwe girtine, li pêşiya hêzên din jî tenê çend rê dimînin:

- 1-Beşdarî û gurkirina şerê ku dest pê kiriye.
- 2-Ji terefan xwestina şer rawestandinê.
- 3-Pêkanîna Cepha niştîmanî-demokratîk û xurtkirina xebata bi gel re.

Hilçînandina xala yekem îro jî feyde pirtir dê zîrarê bi xwe re bîne û tevgerê dê birînen dijwar bigire. Civaka Kurd jî di demeke kurt de dê nikaribe wan birînan bipêçe. Ji bo xala duhem jî tu rê nîne. Dewlet xwe nade ber tu tiştan û bi ya wan divê Kurd doza tu mafan nekî. Kurd û Tirk mîna berê bi hev re bijîn. Alternatîfa ku mirov bikaribe jê sûd werbigire û tevgera neteweyî ber bi amancê ve bigire xala sêyem e.

Dema hêzên niştîmanî yekîtiyê wek vatîniyek neteweyî bidin ber xwe, hebûna hêzên din meşru bibînin û li ser bingehê demokratîk û parastina mafên hev bere saz bikin, dikarin programên reel û nûjen vejtîn û li pêşberî dewletê parêzgeriya mafên gelê Kurd bikin. Bi wî awayî ji gelê Kurd piştgirî bigrin û ji biyaniyan re rewabûna şer û doza xwe bidin zanîn.

## Berpîrsiyarê Medya Guneşî hat girtin

Berpîrsiyarê rojnama Medya Guneşî Mahmûd Metîn di 15'ê Tirmehê de ji aliyê Mahkema Ewlekariya Dewletê a (DGM) Stenbolê ve hat girtin. Sebaba girtina wî, nivîsên hejmara 32'an a rojnama Medya Guneşî ne.

Li ser girtina Mahmûd Metîn Berpîrsiyarê Giştî yê Medya Guneşî Osman Aydar beyanek çapemeniyê derxist. O. Aydar di beyana xwe de li ser kirînen dewletê disekine û girtina Mahmûd Metîn protesto dike.

Ji aliyê din hejmara 34'an ya Medya Guneşî berê ku bê belavkirin ji aliyê DGM a Stenbolê hat berevkin. Mahkemê wek sebeb jî nivîsên ku li ser qatîlama Sêwasê hatibû nivîsandin nişan da.

**Dema hêzên niştîmanî yekîtiyê wek vatîniyek neteweyî bidin ber xwe, hebûna hêzên din meşru bibînin û li ser bingehê demokratîk û parastina mafên hev bere saz bikin, dikarin programên reel û nûjen vejtîn û li pêşberî dewletê parêzgeriya mafên gelê Kurd bikin. Bi wî awayî ji gelê Kurd piştgirî bigrin û ji biyaniyan re rewabûna şer û doza xwe bidin zanîn.**

# Her tişt tê guhertin

S. Bengîn

**D**ema hewa ber bi zivistanê ve hêdî hêdî sar dibe, çend babetên daran yên xwedî xusûsiyêtên bîyolojîk yên cuda ne tê de, dar û berên din tev ji bo ku zivistan neqefilîn û hişk nebin hêdî hêdî pelên xwe diweşînin, qulên biçûk di reh û leşê xwe de digirin, xwe ji bo zivistan, demekî sar û dijwartir amade dikin.

Hirç, havîna, dema germ e û xwarin ji bo wan pirtir e, ji sibê heta êvaran dixwin. Ger tîr bin ji dîsa dixwin. Ji bo ku qelew bibin, pirtir bez di bin çermê xwe de bicivînin ku zivistanê de di qula xwe de neqefilîn û ji nêza nemirin. Ger dar ji û hirç ji wilo nekin, nikarin zivistanê bibûrin û bijîn.

Ger mirov çav û guhê xwe baş bide sirûştê, dê bibîne ku her tişt li gor xusûsiyêtên xwe wê bîyolojîk li gor şev û rojê, li gor zivistan û havîna û li gor demên dirêjtir xwe û jîyana xwe diguherin.

Her tişt bi wext re tene guhertin. Rengê dinyayê, sarbûn û germbûna wê tene guhertin. Mirov ji beşek sirûştê ne. Mirovati jî li gor van guhertinan kar û şerê wan ji tene guhertin. Dem bi her awayê xwe ji demên bûrî cuda ne. Lê mirov pir cara di rojên teng de van rastiya ji bir dîkin, û hawê xwe ye ku dem û jîyanê betal kiriye dewam dikin.

Guhertin ne bi xwestina dilê mirov dibin. Guhertin qanûna hebûn û avabûna sirûştê ye. Û her ber bi baştir, avatir, nûtir û pêşdetir de ye. Ev bi milyaran sal her wilo li dar e û digere.

Dema mirov xwe li gor dema diguherin ne mecbûr in ku armanç û hêviyên xwe ji bi carekê re biguherin. Armanç û xwestina xwe ya pêşxistina civatê, damezirandina civatek bi edalettir, dikarin û pêwîst e biparêzin. Ev ne redkirina demê ye, lê serbilindiya pêşverûbûnê ye. Lê ya pêwîst ew e ku mirov mecbûr in rengê pêwendiyên xwe û metodên tekoşîna xwe û jîyana xwe biguherin.

Guhertin pêşî di sirûştê de dibin, mirov ji xwe li gor van guhertinan amade dike. Carna mirov dikevin pêşya guhertinan jî, lê dîsa jî nikarin rawestînin ya jî bi paş de vegeřînin. Di hêla civakî de dem carna sed salan digirin û dirêj dajon û carna jî pîrr kin in, deh sala tenê digirin. Carna jê civatê ji binî de diguherin û carna jî tiştin dîyar tenê diguherin.

Divê mirov van guhertina zû

bibîne. Wextê wê zûbûnê ji bo mirovan ku bi siyaseta muijûl dibin tengtir e. Ji bo ku mirov karibin bijîn û serketî bin divê şiyar û hemdem bin, xwe li gor demê amade bikin û dereng nemînin. Heke na, di kar û şer û jîyanê de wenda dikin.

Bê guman ev ji bo Kurdan jî wilo ye. Divê Kurd jî xwe li gor guhertinên ku li der û dora wan û li dinyayê dibin, xwe biguherînin û metodên nû bi kar bînin. Kurd nema karin tekoşîna azadkirina welatê xwe li gor metodên buhurî bidin. Wê di hêla can, xwîn û wext de li ser Kurdan buha rûnê. Heke em rojên pêş bidin ber çava, taqeta Kurdan nagihije xisaretek be dawî. Divê Kurd metodên nû li

ber çava negirin, metodên şer ku li temamê dinyayê mahkûm bûne bixebitînin. Emê bixwazin xwe azad bikin û bibin endamê malbata dinyayê. Lewra ji bo me pir girîng e ka ewê çî bîyaran di derheqa me de bidin. Divê Kurd nekewin rewşa pokêrvanekî şerker û li hemû qulûbên dinyayê de nebin bela serê xelkê; ji bo ku herkes nebêje na, wele ez bi wî re naleyizim. Îro bi dar û keviran êrişkirina balyozxanan, ji hêla siyasetvan û xelkê derên ku hêviya Kurdan di piştgiriya wan de ye, wek terorîst tîn nîrxkirin. Dema dewleta Tirk radibe gund û bajarên Kurdan dide ber top û gullan, bê guman heqê Kurdan jî heye ku ji dest xwe herin û bigrin ser balyozxane û mueseşên Tirkan. Rast e wê media dinyayê tev qala Kurdan û bûyerên wan bikin, lê ev yek ji piştgiriya pirtir, wê dijminên Kurdan re dostan pêda bike û wê Kurdan bêtir tenê bihêle. Lewra rûniştvanên dinyayê wek Kurdan li bûyeran nanerin. Yekî Ewropî nikare bûyarên wiha fahm bike. Him wilo bikin û him jî roja din derkevin kolanan bimeşin û doza piştgiriya ji wan bikin! Ev metod salên şestî û heftêyî seranser hatin bikaranîn, lê mixabin hew bûn sebebên bi tenê manê.

Kurd jî hemû miletan pirtir muhtaci ku şewqa xwe deynin ber xwe û li ser van tiştan bifikirin.. Rewşa Kurdan ji gelek hêlên xwe ve ji ya gelek miletan sexttir e. Kurd xwe ji dijminekî rizgar dîkin, yekî din dajo ser Kurdan. Ger dinya xwe nede pişt Kurdan, emê her şer bikin, bêne kuştin, lê tiştêkî ji bi destên xwe nexin. Divê serhildana Kurdan bibe xoşevistiya dinyayê, dilê her kesî ji bo Kurdan lêxe. Ev jî bi metodên şer û kirinên Kurdan mungkûn e.

Ev nayê wê manê ku Kurd divê ji binî de dev ji şerê çekdarî berdin. Na, mirov wî karî jî dike û xwe tenê ji nahêle. Her tişt xwedî usûl û prensîb in. Şer jî wilo ye. Metod hene ku qedexa ne. Şer li hember dewleta dagirker ne qedexa ye. Lê ku Kurd herin gundiyekî Kurd ya jî yekî Tirk, ya jî ji bo ku turist tobe bikin nema bîn Tirkiyê, herin turistekî bikujin, qedexa ye.

Nelson Mandela serokê organîzasyonekê ye ku şerê çekdarî jî dike. Lê ew di dinyayê de wek siyasetvan û diplomat tene nas kirin, ne wek terorîst. Li gor ku xisara dewletên ku di siyaseta dinyayê de xwedî gotin in, hemûyan jî Afrîka Başûr boykotkirine jî, ji wan re dibê ger hûn boykota xwe rakin, hûnê karê me sext bikin, a niha ranekin. Û gelek welat li benda wî ne.

Di Hezîrana 1993'an de Nelson Mandela dawetî bajarê Hollywood dîkin. Rûniştvanên bajêr, artist û denbêj bi giramîyeke bilind jê re galayekê çêdîkin, bi milyonan Dolara didin hev. Lê li mal jî çekdarên wî amade ne, dema ew bêje êriş çekdarên wî diteqînin û dikujin. □

**Îro bi dar û keviran êrişkirina balyozxanan, ji hêla siyasetvan û xelkê derên ku hêviya Kurdan di piştgiriya wan de ye, wek terorîst tîn nîrxkirin. Dema dewleta Tirk radibe gund û bajarên Kurdan dide ber top û gullan, bê guman heqê Kurdan jî heye ku ji ber xwe ve herin û bigrin ser balyozxane û mueseşên Tirkan. Rast e wê media dinyayê tev qala Kurdan û bûyerên wan bikin, lê ev yek ji piştgiriya pirtir, wê dijminên Kurdan re dostan pêda bike û wê Kurdan bêtir tenê bihêle. Lewra rûniştvanên dinyayê wek Kurdan li bûyeran nanerin. Yekî Ewropî nikare bûyarên wiha fahm bike.**

hemdem peyda bikin.

Berê di şer de leşkerên du welatan bi top û tîvingan diçûn hember hev. Kî jî hêla hejmara leşkeran de xwediyê hejmarek pirtir û di hêla zanîyarîya leşkerî de amadetirbûya di şer de biserdiket. Lê îro ne wilo ye. Gelek faktorên din rol dilîzin. De ka bila sibê Dîyarbekirî leşkerên dijmin jî Dîyarbekirê derxin. Ma gelo wê karibin heftekê tenê di destên xwe de bigirin? Na. Beriya ku Kurd dijmin jî Dîyarbekirê derxin, divê diplomatên Kurdan bikin ku parastina Dîyarbekirê ne ji bo Kurdan tenê, lê di qada siyaseta dinyayê de bibe parastina rûmeta mirovatiyê. Divê Kurd xwe nexapînin û zanibin ku di dema îro de welat bi çek tenê nayê azad kirin. Îro şer di sevyeyeke din de dibin. Di şerekî de teknik, siyaseta û diplomati çekên mezintirîn in, û qedera şer tayîn dîkin. Van her sê qewetên bingehîn, qeweta xwe di şerê Xelîcê de xweş diyar kirin. 450 hezar leşkerê welatên rojava, nezî 2 (dudo) milyon leşkerên Iraqê jî hev felişandin.

A dîtir Kurd nikarin rewşa avabûna siyaseta dinyayê ya îro li

Stiriyan me

Zinarê Xamo

## Uzra ji qebebetê mezintir

Heta nuha min digot qey rojnama Medya Guneşî ji ber bêmkanî û tunebûna kadiran bi Kurdî dernakeve. Lê piştî ku min di hejmara 28'an de nivîsa li ser navê Medya Guneşî hatibû nivîsandin xwend, min hîn nuh fahm kir ku ev texmîna min ji binde çewt bûye. Çimkî di wê nivîsê de tene gotin ku ew bi zanetî Medya Guneşî ya jî weşaneke din bi Kurdî dermaxin; ne ku îmkanên wan tunene ya jî qeweta wan nagihîje. Yanî weşana bi Tirkî tercîheke wan a siyasî ye. Ew, derxistina rojnâmeyeke bi Kurdî hewce û rast nabinin lema jî dermaxin. Çimkî li gor îddîa xwediyê wê nivîsê, meriv nikane bi zimanê Kurdî "civatê biguherîne". Ji bo guherandina civatê, muheqeq Tirkî lazim e. Yanî emê civata Kurd ne bi Kurdî, lê bi Tirkî şiyar bikin, "biguherînin". Argumentên di vî warî de anîne pîrr balkêş in:

— Kesên sosyalist, şoreşger û welatperwer tenê bi axaftina li ser civatê nayên serî, ew mesûl in ku civatê biguherînin ji. Eşkereye ku bi weşaneke Kurdî bicî/anîna wezîfeyeke wiha ne mungkûn e. Ev yek him jî ber nizimbûna mustewa Kurdan a xwendin û nivîsandinê û him jî ji ber hewcedariya şiyarkirina bîrûraya Tirkiyê wihaye. Em qebûl bikin yan nekin, dixwaze bila xîtabî hin hisên me bike yan neke, ev rewş rastiyeke. Nexwe tene zanîn ku em dikarin Medya Guneşî ya jî weşaneke din bi Kurdî derxin.

Ev gotin jî nişan dînin ku asimilasyonê ne tene zimanê me, her wisa mejiyê me jî asimîle kiriye, em ji perspektiveke millî dûr xistine, em anîne nuxta înkara xwe yanî felaketa millî!

Bê şik bêtalîhiyeke pîrr mezin e ku ev gotinên jorin li ser navê Medya Guneşî hatine gotin. Û wek şexs, ez pîrr li ber ketim ku berrîsiyarên Medya Guneşî xwediyê dîtineke wiha ne. Lê li alî din hevalan bi vî warî de jî anîne zimên. Erê herkes wek hevalên Medya Guneşî êşkere nebêje jî, lê bi dizî bawerîya pîraniyêke pîrr mezin ew e ku meriv nikane bi Kurdî siyaseta bike, tiştên edebî û ilmî pê binivîsîne. Ji bo kar û xebatê wiha "muhiim" Tirkî şert e. Bêyî Tirkî tu xebat ne mungkûn e. Ku wek tene zanîn îddîa hêzên Kurdan înkâr dîkin ji ew e; Kurdî ne zîman e. Wek Kurd divê em xwe ji vî psîkolojiyê rizgar bikin. Ev psîkoloji pîrr xerab e, destpêka wendabûna şexsiyet û ruhê millî ye.

Bê şik bêtalîhiyeke pîrr mezin e ku ev gotinên jorin li ser navê Medya Guneşî hatine gotin. Û wek şexs, ez pîrr li ber ketim ku berrîsiyarên Medya Guneşî xwediyê dîtineke wiha ne. Lê li alî din hevalan bi vî warî de jî anîne zimên. Erê herkes wek hevalên Medya Guneşî êşkere nebêje jî, lê bi dizî bawerîya pîraniyêke pîrr mezin ew e ku meriv nikane bi Kurdî siyaseta bike, tiştên edebî û ilmî pê binivîsîne. Ji bo kar û xebatê wiha "muhiim" Tirkî şert e. Bêyî Tirkî tu xebat ne mungkûn e. Ku wek tene zanîn îddîa hêzên Kurdan înkâr dîkin ji ew e; Kurdî ne zîman e. Wek Kurd divê em xwe ji vî psîkolojiyê rizgar bikin. Ev psîkoloji pîrr xerab e, destpêka wendabûna şexsiyet û ruhê millî ye.

Îddîa ewe ku Kurdî ji bo "guherandina civatê" nabe. Ez meraq dikim çima nabe? Pîvana nebûnê çiye? Heger qest ew e ku tiştên bi Tirkî tene nivîsin, nikanin bi Kurdî bîn nivîsin ne rast e. Ez îddîa dikim ku hemû nivîsan di Medya Guneşî de bi Tirkî derketine dikanîbûn ji Tirkiya wan jî hîn xweştir bi Kurdî bihatana nivîsin.

Ya din em ji guherandinê çî fahm dîkin? Mesela ji bo dewletê guherandina civatê asimilasyona Kurda ye; lê ji bo me rizgariya millî ye. Di vî merhelê de gava em Kurdan asimîle bikin ev ne guherandineke li gor rastiya me ye, li gor daxwaza dujmin e.

Di mesela "şiyarkirina bîrûraya Tirkiyê" de jî divê meriv qewet û tesîra xwe zêde mezin neke, hinekî realist be. Ji avabûna Cûmhûriyeta Tirkiyê û virde ye ku em her bi Tirkî dinivîsin, bêyî ku em gelê xwe asimîle bikin ka me çî havil kiriye? Îro bi milyonan Kurd bi hawakî objektîv bûne Tirk, vegera wan êdî ne mungkûn e. Helbet Tirkbûn ne şiklê îdeolojîk tenê ye, meriv bi zîman, bi kultur, bi psîkolojiya xwe jî dibê Tirk. A

Dûmahîk: r. 11

Lêkolîn

Nameya General Şerîf Paşa ji Wezîrê Karê Derve yê Rûsya re

“Di nava Kurdan de fikrê dijminatîyê li hemberî Ermeniyan qet tune ye”

**B**erî ku Tirkên Ciwan bêne ser hikum, partiya wan ya "İttihad ve Teraqî" bîrûbawerîya xwe li ser demokrasiyê û wekheviya gelên Tirkîyê û yên bindest didan xuyakirinê. Bi vê siyaseta ew gihîştine wê yekê, ku karibûn hêzên gelên bindest, yên ku li derwayê welêt bûn, bigihîne xwe û bi tevayî şerê xwe li dijî hikumdariya Sultan Ebdulhemîdê Duda xurt bikin. Rewşenbîr û siyasethêzên Kurda yên bi navûdeng **Ebdullah Cevdet, General Şerîf Paşa, Ebdirehman Bedîrxan** û gelekên mayî bawerîya xwe bi siyaseta Tirkên Ciwan anîn. Lê gava Tirkên Ciwan hatin ser hikum û dirutiya siyaseta wan a şovenîzma Tirkîyê di meydana praktîkê de xuya bû û hêzên gelên bindest gişk ji Tirkên Ciwanan qetiyên, dûr ketin û karûbarê xwe li hemberî wê siyaseta berdewam kirin. General Şerîf Paşa yek ji wan kesa bû, ku hema ji destpêkê li dijî hikumdariya Tirkên Ciwana sekîni û dawiyê jî ji Tirkîyê derket çû Parîsê. Li Parîsê ewî hêzên opozîsyonê civandin dora xwe û partiya "Yekîtiya Lîberalên Osmanî" ("Osmanlı Hürriyet ve Adalet Fırkası") damezirand. Bû serokê vê partiyê û berpirsiyarê organa wê "Meşrutîyet" ê. Di dîrokê de ev partî bi navê "Partiya Lîberalan" hate naskirin. Ji Parîsê Şerîf Paşa tev şerê li dijî Tirkên Ciwana û yên demokrasiyê û azadiyê bû, wî bi xurtî pirsê gelê Kurd jî dida xuyakirin. Li ser rûpelên "Meşrutîyet" ê li ser vê yekê meqalên wî yên hejaya agahdariyê çap dibûn.

vînin ser hev û derba giran bigihînin Kurdan. Hêzên Kurdan bê berxwedana xurt, bi hêsanî ji hev belav bûn. Lê **Melle Selîm**, ku serkêşê vê serhildanê bû, bona ku ji destê eskerê Tirkan xilas be, tevî çend Kurda xwe gihand qonsulxana Rûsyayê li bajarê Bidlîsê, parastina siyasî ji wana xwest û li wir xwe veşart.

Hikumeta Tirkên Ciwan ji zerp û kela serhildana Kur-

dên Bidlîsê çavtirsandî bûn. Li ser pirsê Kurda, çawa pirs-girêkeke rojane li meclîsa dewletê, bi dût û dirêj hate axaftin.

Li ser vê serhildanê Rojnamên Tirkan, Rûsan, Ermeniyan û yên Ewropayê yek bi yek sekînin û komentar kirin. Her rojnamekê li gorî daxwaz û feyda dewleta xwe, li ser bûyerên Bidlîsê sekînin û nix danê.

Rojnamên Alman û xasma

yên Tirkan deng bela kirin, ku sedemê vê serhildanê nerazîbûna Kurdan bûye ji reformên, ku di şeş wilayetên rojhilata Tirkîya Osmanî de gerek bihatana derbas kirinê.

Dema serhildanê, Kurda birçî, tazî û zêryayî ji ayetên Quranê dijî neheqîya siyaseta hikumetê kirin slogan û ci ciya jî ala îslamîyê rakirin. Ev yek bû bîngeh, ku rojnameger û karmendên Ewropayê û yên Rûsyayê bi

çavekî tirs û bi şikberî li serhildanê binêrin. Sedemê serhildanê yê bîngehî nedin xuyakirinê. Lê gava bere-bere eşkere bû, ku îslamîtiya Kurda li dijî gelên xaçparêz ne-bûye, çimkî tevbiyên serhildanê tu zerar negihandine Ermeniya û dostanî, dilsoziya xwe hemberî wan diyar kirine, di rojnaman de li ser serhildanê nûçeyên nû çap bûn, sedemê serhildanê yên rastî hatin xuyakirinê.

Dema serhildana Bidlîsê pêk hat, General Şerîf Paşa li Parîsê bû û bi hûrgilî li ser wan bûyera ji Tirkîyê xeber distandin. Wî di nivîsar û axaftinên xwe de sedemên serhildanê yên rast didan zanînê. Name dişand ji karmendên dewletên Ewropa û Rûsyayê re, bona ew li ser vê serhildanê hay ji rastiyê gilyan hebin.

Di arşîva Rûsya Qeyser de namek Şerîf Paşa, ku wî li ser vê serhildanê nivîsiye, tê parastinê. Name, ewî di 16'ê Nîsana 1914'a de ji Parîsê ji Wezîrê Karê Derve re şandiye. Ew name ser blanka Partiya Lîberala, ser pênc rûpela, bi zimanê Fransî hatiye nivîsandin. Armanç û hoya nivîsandina vê namê bi sê pirsê ve hatiye girêdanê. Yek ewe, wekî Şerîf Paşa di riya azadiya Kurdîstanê de roleke girîng daye dewleta Rûsyayê, ya duda, wekî wî xwestiyê piştevaniyê li serokê Serhildanê Melle Selîm û hevalên wî bike, da ku diplomatên Rûsyayê wî nedine destê dewleta Tirkîyê. Ya sîsiya, nîşan da, ku Kurd li dijî doza Ermeniya nînin û ne jî li dijî derbazkirina reforman in.

Nama Şerîf Paşa cara pêşîn e tê çapkirinê, ew dokumenteke bi nîrx e, ji bona ku karkirina wî ya siyasî li vîde-rê, kurdperwerî û dilsoziya wî em çêtir nas bikin û karibin ciyê wî di dîroka azadiya Kurdîstanê de bi hejati bidin xuyakirinê.

Nama General Şerîf Paşa ji Wezîrê Karê Derve yê Rûsya re

Parîs, 16'ê Nîsanê, 1914.

Wezîrê berêz!

Di demek wî de Ewropa li hêviyê ye, kî reformên ku Tirkîyê hildaye ser xwe pêk bîne, dewleta Osmanî bi giftigoyên ser sedemên serhildana Kurda (Li Bidlîsê-C.C) gaya ew serhildan li dijî reforman e, dixwaze bîr û bawerîya civaka Ewropayê bixapîne. Wekî Kurd ez berpirsiyarîya xwe dibînim ku sedemên vê serhildanê yên rast bidim xuyakirinê.

Li Tirkîyê hemû kes dixwazin reform bêne derbaskirinê. Lê bi pêra jî kêm in ew kesên Osmanî, yên ku bawerîya xwe bi vê dewletê, dewleta ku ji Komîteya İttihad ve Teraqî dirûst bûye, tînin. Û bi wê yekê jî (bawer nakin), ku dewlet kare, yan jî qet ne daxwaza wê heye qey-d û qanûnên nû û baştir bide cigirtinê.

Di Tirkîyê de ew bîrewarî pêşde hatiye, kî hikumdarên amade, çî yên xuya û çî yên ku nihênîne, dixwazin îslamê bidin rakirin.

Çawa hemû kesên bê teref şahidiyê bidin, misilman fanatik nînin. Lê belê parêzgerê dîn in û zanin, wekî bi wî va tekûz girêdayîne. Ew timê wê li dijî wî serokî derên, yê ku bi dîtina wan li himberî dîn (ol) derkeve. Hetanî ku serokên Komîteya İttihad ve Teraqî ser hikum bin û bi karanîna hikumdariya xwe Sultan-Xelîf di bin

çavê xwe de xwedî bikin, gava gelek sala şewirdar û xizmetkarê wî bûne, dût nîne. wekî ji aliyê wana(misilmana-C.C) manifestasyonên nerazîbûnê yên xurt pêk bînin.

Bêyî wê jî bawerîya diyanetê li Tirkîyê fakto-reke moralî ye girîng e û ne ku tenê nava gel de gere bê parastinê, lê belê, gereke lê xwedî derkevin, çimkî piraniya gel nexwendevan e.

Di nava Kurda de fikrê dijminatîyê li hemberî Ermeniya qet tune. Serokê serhildanê Melle Selîm ji Papazê Bidlîsê berêz **Sûrên** re nivîsiye, ji bona ku ew ji ber qedera Ermeniya li ber xwe nekeve û zanibe, ku bi rastî li ser wana zordarî çêbûye.

Berêzîya wî zavên beyan daye, ku "Serhildan li dijî dewletê bûye, neku li dijî Ermeniya".

Ji aliyê dinê va jî, li ser bîngeha îzbatiya, wek me da xuyakirinê, em dikarin bêjin, ku tevger ne ya herêmekê ye, lê ya giştîye. Li pey Kurda Erebb û usa jî Tirk gefa dixun, ku wê serî hildin. Ev yek, hîlbet, wê hikmê xwe yê mezin bihêle li ser hoyê peyda bûna û dijîyatîyê, navbera hikumdar û yên ku di bin hikum da ne, ew çî ku yên pêşî dixwazin pêk bînin, yên paşî bi şikberîya pîr mezin qebûl bikin.

Reform wê bi şabûn bihatana naskirinê, heger ew bi destê merivên usa bihatana pêkanînê, parastin û bawerîya wan di bin şikê da nebûya, yanî bi destê merivên usa, ku di parastina îslamîyê de di nava gel de bi navûdeng bûya.


Belkî gelekî diwar be ji bona misilmana reformên Komîteya İttihad ve Teraqîyê ya here qenc jî qebûl kin. Dubarî em dibêjin, wekî tevger berî pêş li dijî hikumetê bûye û zêde-zêde dijî Komîteya İttihad ve Teraqî, dijî hikumeta, ku li pişt perdê sekîniye.

Ji bo ku reform bê zîyan bêne derbazkirinê û yekîtiya İmperetoria Osmanî neruxe. Ewropa berîpêş gere piştevaniyê ji Komîteya İttihad ve Teraqîyê neke. Çimkî her tenê ew e, kî dijî derbazkirina reforma sekîni ye, xetera mezin ji bona bê qeziyabûna yekîtiya Tirkîyê û aştiyê li nava Ewropayê jî wê tînin.

Ewropa tev li vê, gerek bixwaze û bike, ku merivê usa bînin ser hikumdariya Tirkîyê, ku li hemberî wana bawerîya gelên misilman heye. Ji wana bawerîya dikin, wekî ew xizmetkarê dîn, netewe û li sultanê xwe amin in.

Wezîrê berêz, hurmeta xwe yê herî mezin dipêrim dilovaniya we.

Yekîtiya Lîberalan General Şerîf PAŞA



Au moment où l'Europe attend des réformes promises en Turquie, ment ottomans s'efforce d'égarer l que européenne, quant aux causes Kurda, en représentant ce soulève rigé contre les réformes. A titre crois de mon devoir de donner les causeu de l'agitation actuelle.



Celilê Celîl

# Rewşen Bedirxan

Perwîn Îzol



Komek ji rewşenbîrên binêxetê li ser lata Mîr Celadet Bedirxan Kesên li piya: Ji rastê ber bi çepê ve: 1-Adilê Hiznî(sazbend), 2-Silêmanê Mexso, 3-Helbestvan Dildarê Mîdî, 4-Ekrem Derwîş, 5-Sazbend Hisênê Tewfo, 6-Feyrûzê Navmalî, 7- Bavê Gulê, 8- Konê Reş, 9- Beho Şêxo, 10- Nivîskar İbrahîm Mahmûd(rismê Celadet di dest de) Kesên rûniştî: 1- Ferhadê Eçmo, Nûhat, Seydayê Keleş, Hesênê Eliyê Ünîs, Kamîranê Haco, Hizniyê Selîm, Av. Xelîlê Sasûnî (neviyê Eliyê Ünîs)

## Sed Saliya Mîr Celadet Bedirxan

Di 26 Nîsan 1993'an de sed sal di ser roja zayina Mîr Celadet Bedirxan re derbas bû, di vê rojê de piraniya nivîskar, helbestvan û hunermendên bajarê Qamişlo beşdar bûn, di gel gelek mirovên rewşenbîr û zane, roja sedsaliya bûna Mîr Celadet pîrozkirin. Giş bi hev re çûn gundê Mizgeftê û li kêleka "Lata Mîr" kom bûn ew lat bi navê Mîr Celadet tê naskirin, ji dema ku Mîr li ber siya wê rojê xwe dibûrandin û bi Çaçan Axa Haco re di sala 1930'î de dema xwe amade kirin ji şoreşa Agirî re.

Kesên beşdar sûretê Mîr li ser wê latê bilind kirin û bi reneki karnewalî xwe berdan ser sikrê Mizgeftê û sûretê Mîr Celadet di nav destê wan de ta ku gihan kêleka konê Mecid Axa Haco, hingê li wir cejn û sed saliya Mîr Celadet Bedirxan li darxistin.

Di destpêkê de Konê Reş kurtejiyana Mîr da xuyakirin û çend gazin ji kovar û rojname û navendên çanda Kurdî kirin, ewên ku bi tîpen latînî dinivîsin û got:

*"Va îro sed sal di ser roja zayina rêberê zimanê Kurdî, Mîr Celadet Bedirxan re dibuhire, gelo kesî haziriya vê rojê kiriye? Têvî ku bêtirî 10 navendên kulturî û çandî yên Kurdan hatine damezirandin û bêtirî 30-40 kovar û rojnameyên Kurdî tene weşandin."*

*Bavo! Li dinyê ji me kêmtir kes nemaye, millet tevde bûne dewlet û hikûmet. Xwedan kitêb û dibistan, bi tenê em milletê Kurd bi şûn de mane reben, feqîr, nezan, belengaz di destê xelkê de lihîstok...*

*Xelkê hevskarê me kiriye destê xwe, li gor kêf û menfieta xwe berê me ji bakûr dide nûvro, ji rojava dide rojhelatê, lewra divêt em jî bixebitin, xelkê xwe hîni xwendin û nivisandinê bikin û milletê belengaz ji tariyê xelas bikin berê wî bidin ronahiyê...."*

Di pey re Seydayê Keleş helbestek li ser Mîr Celadet xwend. Di pey wî re helbestvan

Hadiyê Qerqatî du helbest xwendin di pesn û giran mîriya Mîr de yek bi Erebi yek bi Kurdî, ev in çend malik ji ya Kurdî:

Ji kêz û moriyên xakê  
meke gazin Emîrê min  
Bizane ku li vê jîne  
hene bêtir ji wan dijwar  
Bizane ku ji çil salî  
nivîstî li wê xakê  
Belê ew tirberperest xane  
ji bo gel tu xweş nîkar  
Bi rawanê te dixum sundê  
li pêşbarî we van tevda  
Ezê navê Celadet Beg  
li ser singê bikim pêykar.

Di pey wan re nivîskar û lêkolînvan İbrahîm Mehmed li ser giranmîriya Mîr Celadet gotarek bi Erebi xwend. Paşê helbestvan Dildarê Mîdî du helbest xwendin.

Di wê navê re, beşdaran ji Mecidê Haco xwestin ku çend gotina bibêje li ser vê bîranîne. Û camêr textsîr nekir û hin ji bîranîn xwe yên li Şamê ku pirê caran li mala Mîr Celadet bû, anîn zimên.

Di pey re Seydayê Mihemed Mele Fexrî derheq mirekên Botan û Bedirxaniyan de axifi. Bi dû wan de Kamîranê Haco li ser girîngiya Mîr Celadet û elfabeya Kurdî-Latînî axifi herweha li ser yekitiya ku roja îro di nav tevgerên Kurdî de çêdibe nemaze li ser ya Kurdîstana Bakur axifi û dilgeşiya xwe diyar kir.

Bi dû tevan de Avûkat Xelîlê Sasûnî, neviyê Eliyê Ünîs peyivî û helbesta Seydayê Cigerxwîn ya li ser Mîr Celadet xwend:

Begê min serwerê min ey Celadet  
Şahê min rêberê min pir edalet  
Tu binivîse di Hawarê selaman  
Ji min ve li Kurdmancan temaman  
Çi Kurmancê Enedol û çî Sûrî  
Çi Goran û çî Loran çî Sorî  
Çi gavan û çî şapan û çî mire  
Gelek bêtir li Kurmancê Cizîre.

Pişt re Av. Xelîl ew helbesta ku di 41 saliya salvegera wefata Mîr de xwendibû, careka din

xwend, ev in çend malik jê:

Bibûre Mîrê Botan û  
tu kêmasiyan bi bexşin  
Ji ber ku maf te nayê dan,  
bi sed helbest û gotar  
Tu mamostê ziman û  
hostayê ziman û tor  
Tu endazyar û serkan,  
hemî name û kovar.  
Herçî Kurd ku dilsozbî,  
ewê nave te carek  
Bi zêravê binivîsî  
li ser singa xwe peygar  
Hetanî ku zimanê Kurd  
hebi carek li gerdûn  
Hezar Mîrên di Kurdistan,  
ku rabin û nû rabin  
Celadet Beg li ser hemyan,  
serok û şah û xunkar.

Di pey xwendina helbest û gotaran re hunermendên me dest bi şahiyê kirin, di destpêkê de sazbandên folklorê Hizniyê Selim (Bavê Adil) dest bi sazê kir û çend sitranên bav û kalan, bi dengê xwe û awazên xwe têlên tembûra xwe weşandin, qaz û quling ji ezmana tanîn xwarê, hingê wî Ehemmedê Fermanê ku li Şamê ji Mîr Celadet ra distira anî bîra min.

Bi dûde Hisênê Tewfo bi saza xwe ya şêrî û gotinên Seydayê Cigerxî û Av. Xelîlê Sasûnî û Hadiyê Qerqatî, em dibirin qonaxên dûr û dirêj, em dibirin serê çiyaan û zozanan....

Piştî Hisênê Tewfo, Adilê Hiznî bi deng û awazê tîla tembûra xwe û gotinên Av. Xelîlê Sasûnî, Ferhadê Eçmo û Salihê Heydo, gol û newalên gundê Mizgeftê dadigirt...

Di pey teva re, Beha Şêxo, birayê Mehmed Şêxo bi saz û dengê xwe sitranên birayê xwe got, hingê tev teyr û tîlûrên wê heremê li me şiyar bûn û roja bûna Mîr Celadet Bedirxan bi mere pîrozkirin.

Bi vî rengî roja sed saliya bûna Mîr Celadet Bedirxan hat pîrozkirin. Sed rehmê li giyanê wî bibare.

Konê Reş

Îro 11 ê Tîrmehê 1993'an e. Di xwazim di yek saliya mirina wê de Rewşen Bedirxan yad bikim.

Ne dût e ku xwendevanên Armançê bibêjin "Rewşen Bedirxan di yekê Hezîranê de miriye û tu dixwazi îro wê yad bikî ma ev çî ye?" Belê rast e, Rewşen Xanim di yekê Hezîrana 1992'an de çûye ser heqiyê û ji ser mirina wê salek û çil û yek roj derbas bûye. Lê ez wê îro yad dikim. Ji ber ku wê bi xwe roja 11'ê Tîrmehê wek roja mirina xwe qebûl dikir. 11 yê Tîrmehê ji wê re bi du aliyen ve girîng bû, ya pêşin: Ew roj roja bûyîna Rewşen Xanim bi xwe bû, ya duduyan jî, roja mirina pîsmamê wê Celadet Beg bû. Ji bo vê sedemê min xwest wê di vê rojê de bîr binim. Rewşen Bedirxan yek ji wan jinên Kurd e ku bîranîn heq kiriye.

Rewşen Bedirxan, di sala 1909'an de li bajarê Qeyserî (li Tirkîyê) hatiye dinê. Dema hîn ew zarok bûye bavê wê Salih Bedirxan mala xwe bîriye Jamê û li wir bi cih bûye. Dibistana destpêkê li Şamê tamam kiriye. Piştî wê dibistanê ketiye "Dar el Mualimîn" û ew dibistan jî di sê salan

bû. Her dixwest tiştên baş bike û vejîne. Ji bo xwe û ji bo miletê xwe tiştên heja biafirîne. Meqaleyên wê di gelek kovaran de çap bûn. Di kovara "Minêvra", kovara Yusif Melek de di derheqê Kurdan de hin nivîsên Erebi daye weşandin. Di kovara Hawarê de, du meqaleyên wê yê Kurdî çapbûne. (Lê wê bi xwe digot Kurdiya wan maqaleyan Celadet Beg nivisandiyê.) Her du meqaleyên wê jî li ser jin û bextiyariya jinan bûn. Ji wan yek bi navê "Kebanî û Mamoste" a din jî bi navê "Jin û Bextiyariya Malê" ye

Hin pirtûkên Tirkî wergerandine Erebi. Pirtûkên ku kirine Erebi ev in:

- 1- Bîranînên Jinekê
- 2- Evîn û Dêrdên Min
- 3- Bîranîna Mamostayekê
- 4- Di sala 1954'an de ji edebiyata

Kurdî hin tişt civandin hev û ew wergerandin Erebi. Bi navê "Ji Edebiyata Kurdî Hin Rûpel" weke pirtûkek weşand.

5- Di sala 1990 de "Ji Mustefa Kemal Paşa re Nameyek" ji Tirkî wergerandiye Erebi, ev name Celadet Beg ji Mustefa Kemal re şandibû.



Rewşen xanim li Kurdistanê Iraqê bi jinên Kurd re

de qedandiye bûye mamoste. Du salan li Urdinê wek mamoste xebitiye, pişt re vegeziyaye Şamê û li wir mamostetiya xwe domandiye. Di hin dibistanên Şamê de jî wek mamoste xebitiye. Di sala 1946'an de bûye mudura dibistana ku tê de kar kiriye, piştî salekê dev ji mamostetiye berdaye, teqawut bûye.

Di wê navê de du caran zewiciye. Mêrê wê yê pêşin yekî Erebi bûye. Cara duduyan bi Celadet Beg re zewiciye. Sê zarokên wê çêbûne, du keç û lawikek. Keçek wê, ji mêrê wê yê Erebi çêbûye.

Bi kurtayî ji jiyana Rewşen Bedirxan ev bû. Lê bi ya min aliyê wê yê ku divê meriv li binivîsîna aliyê xurtbûna karektêra wê ye. Rewşen Xanim dixwest rîyeke rast ji bo jinên Kurd veke. Weke malbat, ji doza Kurdan re xizmet dikirin. Doza Kurdan, wek doza xwe qebûl dikir. Ji hemû tiştan girîngtir ew e ku ew, ji xwe pir bawer bû. Heya dawîya ji jiyana xwe dixwest tiştên baş bike. Ji bo wê jî wextê xwe qet vala derbas nedikir û pir bi disiplin dixebitî.

Jiyana wê (bi qasê ku min didît) pir bi rêkûpêk bû. Kesên ku wê bi ciwanî dinasîn, digotin "Ew di ciwaniya xwe de jî bi rêkûpêk

6- Di sal 1991'ê de pirtûka bavê xwe Salih Bedirxan bi navê "Bîranînên Min" ji Tirkî wegerandiye Erebi.

Bi vî awayî em dikarin bibînin ku Rewşen Bedirxan di 1947'an de piştî ku karê xwe ye mamostayî tamam kiriye û li malê rûniştîye, dest bi wergerandinê kiriye. Û xwestiye di nav nivîskarên Erebi yên jin de cih bigire. Erebiya wê xurt bû, di sala 1987 an de du zanyarên Suryê Merwan Misrî, Mehmed Elî pirtûkek di derheqê jinên nivîskarên Sûriyê amade kiribûn navê pirtûkê jî "Nivîskarên Jin li Sûriyê" bû.

Di wê pirtûkê de wan çêl li Rewşen Bedirxan kirine û ew di nav rêza nivîskarên Sûriyê ên jin de bi cih kirine.

Ji van xebatan pê ve, Rewşen Xanim di gelek cihên girîng de wek jineke welatparêza Kurd temsila gelê Kurd jî kiriye.

Ji van a girîng konferansa sala 1957'an e ku li Yunanîstane çêbû. Di wê konferansê de Rewşen Bedirxan wek nûnereke resmî ya Kurd, li ser navê Kurdan beşdar bûye û xwestiye doza Kurdan di wir de biparêze.

Rewşen Bedirxan bi Erebi, Tirkî, Kurdî, Îngilîzî û Frensizî zanibû.

Teyar Germavî :

# “Daxwaza me ew e ku zimanê Kurdî li hemû xwendinxaneyan bibe zimanê xwendinê”

**Teyar Germavî berpirsiyarê Leqê Dihok û Ninowa ya Yekîtiya Xwendekar û Lawên Demokrat ên Kurdistanê ye. Teyar ji gundê Germavê ser bi parêzgeha Dihokê ye. Ew bi salan wek pêşmerge di nav rêzên gelê xwe de tédikoşe. Di sewiyên cihê yê Yekîtiya Xwendekar û Lawên Demokrat ên Kurdistanê de dixebite.**

**Hevalê me Hecî Kardoxî li ser navê Armancê bi Teyar Germavî re peyivî.**

**Armanc:** Yekîtiya Xwendekar û Lawên Demokrat ên Kurdistanê ji bo kîjan pêwîstiya û kengê hat avakirin?

**T. Germavî :** Ez sipasiya hevalan û vê rojnama heja dikim bo vê çavpêkeftinê.

Yekîtiya me encama pêwîstiya dîrokî û rewşa welatê me ye û di 18'ê Sibata 1953'an de hatiye damezrandin. Ji ber ku xwendekar û lawên Kurdistanê wek yê her milletekî pêdivî bi rêxistin û yekîtiyekê hebûn ku bikaribe hêz, û şiyana wan bicivîne ser hev û di xizmeta wan û gelê wan de bi kar bîne. Û her weha bikaribe di çareserkirina pirsgerên xwendekar û lawan de alîkariya wan bike, li hember dezgehên berpirsiyar temsîla xwendekar û lawan bike. Di civatê de maf û azadiyên xwendekar û lawan biparêze, hêvî û daxwazên wan bigihîne cihên berpirs.

Barzaniyê nemir jî gotiye ku "Xwendekar di hemû raperîn û şoreşan de serê rimê ne".

Yekîtiya me ji roja damezrandinê heta îro, di rêzên gelê xwe de li hember nezanî û cahiliyê û dema ku pêwîst jî bûye, çî di Şoreşa Îlonê de, çî di Şoreşa Gulanê de endamên me wek her Kurdekî welatparêz çek di dest de li dijî rejîma dagirker şer kirine. Karwanê şehîdên yekîtiya me dirêj e. Nimunên xebata me Leyla Qasim e, Kurdistan Salih e, Evdil Xalit Sipîndarî ye, M. Debax e, Simko Amêdî ye, Subhî Îsa ye, Ubeyd Piroz e û h.w.d. in.

Avahiya rêxistina me demokratîk e. Rêxistin şengistê herî giring ê vê rêxirawê ye û em vê giring dibînin. Me buroya sekretariyê heye û ser astê Kurdistanê serkirdayetiye dike. Li Kurdistanê pênc leqên me hene û her leqek niwîneriya deverê dîke ku leqa me ya Dihok û Neynawa ji wan yek e. Ji bo nimûne, leqa me ya Dihok-Ninowa ji 12 komitên de veran, komî tînan navçan pêkhatiye. Komîta navçê, qezayekê yan komalgehêka berfireh wek qada xebatê daye ber xwe. Herweha peywendiyên me digel rêxirawên xwendekarên Kurd li Ewropa baş bûne û ev jî bûye hoyê hindê ku pêwîstiya avakirina rêxiraweka xwendekarên Kurd li Ewropayê

nehatiye dîtin, ji ber ku ew wek nunerên yekîtiyê tînan hesabandin.

Ji ber rewşa taybeyî ya welatê xwe, me xwendekar û ciwan di nav yek rêxistinê de bi rêk xistine, lê di bingehê de hem ji aliyê rêxistinê, hem ji aliyê qad û metodên xebatê ve ji hev hatine veqetandin, xwedî program û destûrên cihê ne.

**Armanc :** Rola xwendekaran çî ye, bi taybeti di nav civaka Kurdî de?

**T. Germavî :** Xwendekar yan komelgeha ku xwendekar di nav de jîyan u wexte xwe lê dibûrînin, xwendinxane ne. Helbet xwendinxane cihê ferbûn u zanyariyê ne. Xwendekarên me jî bo fêrbûnê gelek xwîngerm in û gelek bizav dikin bona zanîne. Ronahiya xwendekaran roj bi roj xwe dide komelgeha Kurdî û civak bi alîkariya wan pêşve diçe. Taybetiyek li Kurdistanê heye ew jî ev e ku şoreşa Kurdistanê berdewam hemî îfîmada xwe daye ser cotkaran û cotkar jî taxeke ne rewşenbîr in. Lewra bi giştî ji ber hindê ye ku pêwîstiya bi ciwanên zana û jîr xwe daye pêş û çî di warê zanîna teknîkî û çî jî di warê mejî de xwendekar û laçên me ji bo pêşxistina civakê rolekî serekî listine.

**Armanc:** Di xebata xwe de Yekîtiya we pêrgî kîjan astengan dibe?

**T. Germavî:** Bê guman wek hemû dagirkeran, Beesiyar jî xwestine ku gelê Kurd li başûrê Kurdistanê her tim di nav taristanîyê de, ji zanîne bêpar bijî. Ji hilweşandina gundan- xwendinxane jî pêre-, ji erebkirinê, ji terora fizîkî li dijî xwendekar û lawên Kurd, ji parastina sîstema eşîrtiyê, heta beesikirina xwendekar û lawan, Beesiyar hemû rê bi kar anîne ku xwendin û zanîn li nav Kurdan pêş nekeve. Elbet belavbûna zanîne û peşkeftina xwendekaran ne digunciya digel bîr û baweriyên Beesiyar. Lewra xwestin bi her awayî xwendin û xwendinxaneyan nehêlin, yê hene jî zimanê Erebi û kultura Ereban tê de serdest bi-



Nûçegîhanê me H. Kardoxî (yê li milê çepê) bi Teyar Germavî re (Foto: Armanc)

kin. Dîroka me ya piştî şkestina şoreşa Îlonê pir e ji şerê Kurdan û Beesiyar de li ser unîwersîte, fakulte, dibistanên meslekî yê li Kurdistanê û xwendina bi zimanê Kurdî. Wan her tim xwestine dibistanên xwendina bilind li Kurdistanê nebin. Xwendina bi zimanê Kurdî nemîne. Bi taybetî li devera Behdînan giraniyêke taybetî dane ser erebkirinê û nehêlana zimanê Kurdî.

Rewşa me ya îroyîn piçekî cihê ye. Kurdistan azad bûye. Lê îmkânên maddî, teknîkî, aletên xwendinê pir kêmtir in. Xwendina

bi zimanê Kurdî li seranserê Kurdistanê dest pê kiriye. Unîwersîte û fakulteyên nû hatine vekirin, lê ne pere, ne pirtûk, ne îmkân têr dikin. Her weha astê xwendina bilind ya li Kurdistanê, li dinyayê, li ba UNESCO yê hîn nehatiye qebûl kirin. Em daxwaz dikin ku xwendina astê bilind ya li Kurdistanê, li dinyayê li UNESCO bê qebûlkirinê û dîvçûn bo hebe bo hindê ku xwendekarên me piştrast û piştgerm bibin di xwendina xwe da.

**Armanc:** Hêzên siyasi, millet bi giştî çawa berê

xwe dide texa xwendekaran û yekîtiya we?

**T. Germavî:** Berêxwedana hêzên siyasi li ser yekîtiya me cida cida ne. Ji ber ku yekîtiya me, Yekîtiya Xwendekar û Lawên Demokrat ên Kurdistanê di 18'ê sibata 1953'an de bi biryara Partiya Demokrat a Kurdistanê hatiye danan ku di wî çaxêde yek serkanîya siyasi ya Kurdistanê bû, lewra heta nûke jî ev alîkarî û ev piştevanî ya Partiya Demokrata

*Dûmahik: r.11*

**Dilşad Amêdî :**

## “Xwezî ARMANC bi herfên Erebi çap bûbûya”

Dilşad berpirsiyarê Yekîtiya xwendekarên Lawên Demokratên Kurdistanê ser bi lijna Amêdiyê ye. Piştî tîkçûna şoreşa sala 1975 digel malbata xwe koç dike diçe Îranê. Piştî ku şerê Iran û Iraqê dest pê kir careka di vegeriya bo Kurdistana rengîn û di nav hêzên pêşmergehan de bi salên dirêj xebat kir. Di dema serhildana 1991'an de di raperîna gelê Amêdiyê de roleke mezin da ser milên xwe. Niha Dilşad berpirsiyarê Yekîtiya Xwendekar û Lawên Demokrat ên Kurdistanê yê lijna Amêdiyê ye.

Me ji Dilşad li ser rewşa Kurdistanê ya berî rizgariyê û piştî rizgariyê pirsî. Dilşad weha li me vegerand:

*"Tiştêkî pîroz e ku îro Kurdistan di bin kontrola Kurdan da ye. Ferqa îro û duh pir in. Lê karê giran, avakirina welatekî li benda me ye û ev jî ne ewqas hêsan e, belkî girantir e ji qonaxên ku heta îro em jê derbas bûne."*

Dilşad nêzikahiya di navbera hemû partî û rêxistinên Kurdistanî de, hîlbijartinên demokratîk, danîna parlamento û hukûmeta, wek wezîfên bingehîn dibîne û ji bo biserketina van karan jî kîfxweşiya xwe tîne zimên.

Me pirs xwe ya li ser alfabe û zimanê yekgirtî ji Dilşad jî kir.

*"Bi rastî ev pirs pîrseke gelek ciwan e. Wekî*

*em berê xwe didinê bi rastî pêdivî ye ku di pêşerojê da tîpên Latîni bêne bikarînan. Lê îro em dibînin ku heta niha ji ber zulm û zordariya dijmin tesîr li ser hatiye kirin ku em mecbûr mane herfên alfabeya Erebi bi kar binin. Îro jimareka kêmtir ji Kurden başûr tîpên Latîni dizanin û bi kar tinin. Lê daxwazê mezin heye bo fêrbûna tîpên Latîni.*

*Berî nûke me kursên fêrbûna tîpên latîni vekirin, di nav xwendevanan de intereseke mezin hebû."*

Axaftina me ya bi Dilşad re li ser rewşa xwendekar û lawên Kurdistana Başûr dewam kir. Dema ku me qala rewşa çapemeniya Kurdî kir, gotin hat ser rojnâme û kovarên bi Kurdî yê li derveyî welêt û min qala Armancê kir.

-Dilşad got ku navê Armancê bîhîstine, nedîtibûn û mixabin berdewam jî nayê Kurdistanê. Piştî dîtina Armancê û hinek informasyonên li ser, Dilşad weha got:

"Hêvidar im ku ev rojnâme berdewam be li ser xebatê. Heta niha me zanîneke kêmtir li ser rojnâme Armancê hebû, piraniya hevvelatîyên me hay ji vê rojnâmê tune ye. Em dizanin Armanc tiştên pir heja dinivîse, lê mixabin em ji van tiştan bêpar in. Ger ku îmkân hebana Armanc bi tîpên Erebi jî derbiçyana wê gelek baş bûya, daku piraniya xelkê me sûdê jê wergirin."

# Çîrok

**K**êlika ku ket derî, devê diya wî bi gazeke ji hev vebû:

-Lawo ka guhê te. Remo rebeno?

Bi dengê diya wî destê wî dirêji cênika wî bûn. Tilfîyên wî li şûna guhê wî yê çepê vala çûn û hatin. Remo veciniqî. Çavên wî çûn nav serê wî. Diya wî bi herdu piyên wî girtin. Bi çavên mişt pirs li dewsa guhê windayî nihêrî. Serê wî zivirand. Guhê rast di cî de bû, lê hinekî sor bibû.

Gotinên diya wî mîna dilopên tîrsê bi ser da hatin xwar:

-Qey naêşe lawo?.. Kê wîlo li te kir Remo?!

-Na, naêşe, sibê ezê herim ba doktor.

Lê "sibê" nehat û nehat.

Raket. Rabû. Dît ku hîn şev e. Katjimêr digeriya. Bû heft. Bû deh. Şev neçû. Rojek din çû , lê roniyê neda ser reşiyê.

Ji nişkêve bû qelebalix. Xelk derketin nava gund û li çarekê gerriyan ku ji vê rewşê derkevin. Bû xire, cira gundiyan;

-Ka em çi bikin.

Hinek beziyan mizgeftê û dest bi nimêj û gaziyan kirin, hineka roji girtin, şekir û berx kirin "sed-qê".

Sibehê dîsa ro dernehat. Teneke dîsa derxistin. Bi dar û bêra kirin teqe-req. Wek berê dema ku heyy veşartî dima. Vê carê ne heyy, ne sitêr ne ji ronahî. Tişt nedihat xuyakirin. her ku xortin dişandin bajarê dût, ji bo ji reşiyê rizgar bibin. Wan ji ev bersiv bi xwe re tanin; -Ev karê Xwedê ye, ne karê me ye..!

Bi vî awayî gund bû kulmek tenî. Dizî pir bû. Kuştin zêde bû. Kertfirosên yanêsib bûn bi sedan. Boyaçî, ettar, dendikfiros, namûs-firos, cûzekar, qûmarçî, qaçaxçî, bazirganê bîbext. Sîkakên gund tiş gemar bûn. Gund ji her tiştê baş paqij bû.

Roj bi roj xelqê ronahî ji bîr kir. Bûn hevalê şevê. Reşî bû konê tevan. Karê xwe berdewam kirin. wek berê, lê Remo nikaribû ev rewş "qebûl" bikira ji ber vê yekê ji xwe re bi melûlî digot:

-Ne dût e ez guhê xwe yê din ji bi ser dim tevî ku ji diya xwe sedema jêkirina guhê xwe veşart, lê gelek mirova pê zanibû.

Rojekê ji rojên Xwedê, berê xwe da bajêr. Li postê siwar bû. Remo dît ku poste incax pêncî salî bighêje bajêr. Pîrekek di postê de za. Du-sê jin avis bûn.

Dawetîni li dar xistin û zewicin. Dîsa poste negihîşt. Hinek mirin, ew bi rê de veşartin û poste negihîşt. Remo bû pizot, arama wî fûriya, şewitî, hat ku dev li xwe ke. Poste, turembêl, kemyon, kerteker teqiyar. Guhertin, bu xir-ecira wî û ajoyanê postê, xwe rakîşandin hev, rêwîyan ew ji hev kirin. Kulmoza leşkeran derbû, serokê wan zirt lê kirin: -Ezê guhê te yê din ji jêkim eger tu zimanê xwe dirêj bikî careke din. remo bawer nedikir ku ev rawestandin ji postê bi xwe ye. Bi xwe nikaribû. Dengê wî her kêlikê bilind dibû: -Bi Xwedê ev sûcê ajoyanê xwar e.

Xwest ku ajoyan "dîreksiyon"ê bide destê wî, lê ji tîrsa leşkeran newêrîbû. Pistepista wî ji guhê ajoyan neket. Rêwîyên siwarên postê li ber dilê wî didan û digotin:

# Guhê Jêkirî

Ebdûhelîm Yûsif

-Remo em tev wek tene, ma qey tu ji me çêtir î? Yekî qelew ji dawiya postê xwe rakêşand Remo. Bi riwekî tîrs got:

-Ma qey tu ji xatûnê yî û em ji cêriyê ne lawo de bi hêl poste bimeşe, te serê me gêjkir heyran. Xwedê ji te razî be, em dixwazin rakevin. Piste-pist xurt bû. Remo kêfxweş bû. Remo kêfxweş bû. Çend mirovên din ketin rêza wî. Zarokan dest bi girî kirin. Bêtir kêfa wî hat. çare ew e ku ew bibe ajoyan, lê dema ku nêzikayî li ajoyan kir, tiliya wî çû ser bişkokeke sor û dewîşand. Poste mişt leşkerên har bûn.

Bi qepera Remo girtin. Tu kesî negot çima. Bû bire-bira leşker: Kî mîr e wê serê xwe rake, wek Remo?!

**K**erî tev bi hev re te-wiyan. Kêrekê guhê Remo xist ber lingê wan. Xwîn bi qîrkê ve herikî. Gewdê wî ji hate xwar. Li erdê bû wek kalax. Leşkerêkî guhê jêkirî bilind kir û bi sistî got: Vî guhî ji bîr nekin ha, "ceza ev e, yekî dilê ajoyanê me bihêle".

Remoyê bê hiş bi xwe re vege-randin û xelkê dest bi xewê kir. Ji xewê radibûn xewa wan dihat. Berdestkê ajoyan ji av dida yê şiyar. Tu kesî nizanibû ku ew av tîjî dermanê xewê ye. Tevde xewixîn, gêj bûn, gelek caran ajoyan radiket û poste wîlo diherikî. Kesekî newêribû bigota "Na" yan "Çima". Ajoyan di bin simbêlê re dikeniya dema didît ku her yek li ser guhê xwe yan pozê xwe ditirse. Ev şeva giran ji nema xwe ji ser gund dida alî.

Reşî bû kiraseke ji hesin û xwe li laşê gund pêça. Remo li gund bû Remoyê "bi guhekî". Gundî her yek bi xwe daketibû. Çi dibû, çi dihat serê wan digotin: Ev qedera me ye.

Koçên biyaniyan li hawîdora gund bûn xelek. Fermangêhê erdê gundiyan giş li wan parve kir. Têvde kirin xwedî qad û malên çimento, çandîdî, traktor, tirimbel, demance, çek dan wan. Gundî ketin hev ji ber tîrsa leşker û biyaniyan. Hineka mala xwe ji wan re vekirin û di nav hevde gotin:

-Qedera me ye...Lê biyanî bi birina erdan tenê qayîl nebûn, bistan talan dikirin û ava çem gemar dikirin. Çavên xwe berdan bênderên gund. Cênikê Remo lêxistin. Di xwe de keliya: Heta li vir û bes. Sibê wê bîn jinên me ji me bistînin. Ket nav gundiyan û zengilê xeterê lêxist.

Hinekan cilkên bênamûsyê avêtin ser çavên xwe û mîna çîrçîrkan sekinin, lê ji serpêhatiya postê zanibûn ku piştê wî li diwarekî ji kayê ye. Ev gundên pepûk tu carî fêrnebûne ku serê xwe hildin li ber zora biyaniyan ku dewlet ji wan re bibû bav:

-Emê bi zorê bênderan bajon. Mafê me ye..! Dewleta me ya hevparî ev daye me. Gundiyan

rahiştin dar û kêrên xwe, şeva ku biyaniyan teraktorên xwe amade kirin, tevde derketin pêşiya wan û qêrîna Remo bilind dibû:

- Em vê zorê qebûl nakin, yan em kuştî, yan em nahêlin hûn bênderên me bajon.

Deng tev li hev bûn: Ji Xwedê bitîrsi lawo...Ma qey çavê we tîr nabe? Xwedê mala we xera bike. Xwîna we rijiyaye çavê we bavo! Biyaniyan ji zimanê xwe vedigerandin:

-Ciyên ku hûn jê hatine, vegerinê. Divê hûn malên xwe barkin ne em...!

Xwiya bû peyv nema sûtê dikin. Ketin nav hev bi dar û kêran, wê şeva mîr û xortên gund tevde mêvanên zîndanê bûn. Şeva din bênder tevde ajotibûn, di bin siya demançên leşkeran de. Biyaniyan genimê xwe çandin, gundî tevde linkul, devbixwîn, serpelixî, ve-geriyan malê.

Bû kûr-kûra diya wî û destmalek da dest ji bo şûna herdu guhê jêkirî veşêre. Bi dengêkî xav jê re got: Qey qedera me ye, ku em heta mirinê kole bimînin!

Remo ma bêguh. Goştê wî dem bi dem dadiwerivî. Canê wî ziwa dibû, çavên wî sist dibûn. Li ney-nikê dinêhirî, ji xwe ditirsiya. Her dihat ku bipeyive, zimanê wî dibû textîkek kevn. Kerteke sor ji bêrika xwe derxist, bi çavên tîjî mirin lê nerî xwend. Nifûsa wî di

nav her deh tiliyên wî de bû qeto qeto. Di pencere re qetên nifûsê li bahozê siwar hatin. Bûn cîq û firriyan, heta wenda bûn. Remo tengirî bû. Derket devê derî, dengê diya wî hatê:

-Vê şevê tî herî ku lawo!?

-Ezê herim nav gund, yadê.

Gundî bi qelemaçe dilizî. Malek bê qelemeç tune ye. Remo gavê avêt, li gewda xwe nihêrî, destê wî jêket. Vegeriya rahişt destê xwe, meşiya, Hemrîn hate bîra wî.

Qîza Cemşid yara wî ya zemane-kî dema ku du guhê wî hebûn, dema mirov bû, lê gava ku navê wî bû "Remoyê biguhekî" Hemrînê hat guhertin. Ji wî ditirsiya. Jê dût diket. Çawa berê dema wî didît kulîlk li rû diketin. Nuha ewqasî madtirş û rûziwa dibê dema wî dibîne. Lingê Remo hilweşiya. Ket. Li dû ma, zivirî, di ber xwe de got:

-Wek diya min dibêje.. ev ji qedera me ye..! Pîsîkeke sipî xist çewalekî û berê xwe da gir-mezelê gund- li cem gora bavê xwe koncalek kola. Rahîşt pisîka-sipî. Herdû destê xwe li qirka pisîkê pêçan. Bîn'lê çikand, ew fetisand. Ziqîni ji pisîkê hat û termê wê li ber sola wî ket. Di guhê pisîkê de bi nermî got:

-Tu Hemrîn î ya na? Navê te Hemrîn e.. û kenîya. Laşê pisîkê di koncale de dirêj kir û di bin axê

de veşart. Komek kevir danî jora axê. Dest bi girî kir. Çav lê sor bûn. Xwest vegere malê. Bi rê de, serê wî jê ket, gindirî nav heriyê, matmayî ma:

-Havîn û herî..!

Devê wî peyivî bi du lûvên pûç: -Tu çi serê xwe dêşînî. Roj nema tê. Nema tê. Herdu çav ji cî derketin û hêsir barandin:

-Ji bo Xwedê tu razê.. Te xew li me kirye hesret. Pozê wî yê ketî kir xinxin:

-Hemrînê çû..Û hey çûûûûû.

Enî qul bû, şikest, mejiyê wî rijiya nav heriya û got:

Li min bibûre Remo. Ez bûm sedemê êşa te, lê zanibe dilê te ji alî min ve bû, heta me temenê te tune kir. Dilê wî mîna gogêke sor di heriyê de çikiya:

-Ez berê kuştî me..! Kuştî ji nikarin tu kesî bikujin. Dil, mejî, çav, dev, poz, ling, tevde di reşiyê de bûn. Ketin nav hev, bûn laşek. Bûn merivekî perîşan û jar ku navê wî Remo ye. Remo vegeriya malê. Derî vekir, şev dereng bû. Mala wî du ode bû, yek ya diya wî, yek ji ya wî bû. Bêriya diya xwe kiribû.

Perî dihatin bîra wî, dema diya xwe raketî didît. Destê xwe pe-land. Derî li diya xwe vekir. Qişîna kûçikekî birîndar jê hat.

Termê diya wî, ya weris li qirika wê gerandi, li valayîya odê di-hêjiya û pisîkekî sipî, mezin, qelew û birçî li hevîya ketina laşê diya wî bû. Saw kete nav xwîna wî, tevzînokan goştê wî dicût. Reviya. Derî bihêz girt, xwest tê-keve oda xwe. Zirz derî vekir, çavên wî ketin du çavên beloq û fireh. Laşê wî ji -wek ê diya wî-di dilê reşiyê de daleqandî di-hêjiya. Li zimanê xwe yê kişiyayî zîq di-nêrî û mîna dîwarekî derizî hat xwarê.

## RONO û sirûdên bêrikirinê

### Kila Şevê

Ahmed Huseynî

Yara min...!  
Di aşê vê şevê de li qîrçiqîrça parsûyên xwe û li hêrana toven xewnê guhdarî dikim. Diramim, her ku diramim, hest dikim ku anîha tu çavîrêmana pêxemberekî rûş û nameyên bêpayan, dikî.  
Diramim!. Gelo dê kîjan sirûd ligel hala dûrgehê û ligel bejn û bala axîna te yî ku di dilê min de zixt û amas e, bigunçe.?!  
Reng e ev katjimêrên tewankar li cem zuhabûna te rawestin. RENG e ev stîranên dilrevîn û sermest, rojekê, gîhayê lûvên te ji xwe re bikin çêgegehên heyinê! Ma gelo tî bîra te?  
Hildiperikim gerdena te, min bîna porê te tevli axa giyanê xwe dikir, min di destê hişê te de çavgirtî baz dida, ku nêzî neheniyên te dibûm, bi xweliya jîbîrbûyî ya dîroka jîbîrbûyî, dilukumim. Min temenekî qermiçî û şemendeferek westiyayî bi dût xwe dikîşikandin. Û ji nişkê ve, ez dibûm koçbarî di cil û bergên welatê gunehkariyê de, ji dayik dibûm.

Erê yarê!! Xaniyê me ji herî û kelpîçan bû. Em bi kulînan re, bi kulek û kileran re, bi qubale û yanan re, bi dik û qewlikê dîwaran re mezin dibûn. Her heftî bi kotekî me carekê berê xwe dişûşt. Di nav destê berberan de qajeqaja me zikê esman diçirand. Hemî pêlavên dinyayê xwe li ber me nedigirtin. Ême em ji piyên xwas û ji kirasên gemarî û ji lîska zirnazîqê û ji qazimazî hez dikin.  
Subehan, bi zorê, em ji ber tava havînê û ji nav livînan dikîşandin. Wê gavê hê me qehwa subehê û cigarên qûnpembo û mûzîk û derdkêşan nas ne-

kiribûn. Herweha me nedizanî ku ev jîyan dê lapûşkên xwe di kezeba me de daçikîne, dê me bi saxî veşêre, dê sal bi sal benê sêdara xwe li gewriya giyan tengtir bike!!

Hêdî hêdî me xwe ji dayik û bavên vedidîzî. Kuç û kolanên bajêr di fikandîna me de avjenî dikirin. Em li derî bajêr û li dervî desthilatdariyan wan bûnwerên dilhişk, li hevdu kom dibûn. Jûrên me bi newqên me ve helawistîne. Dismalê me li qirikên me girêdayîne. Bi lez û bez pirojeya talanê tî ron kirin:

-Misînekî sifir ji mizgefta TAXA HERBIYA-Hinarên mêxweş ji beçê MELE HESEN-Nîçîra mirîşkek sergerdan.

RONO!

Ez zarokê te me, şîrê xemgîniyê dixwim. Ev subeh tal e, zilindar e, ma gelo SEBR e?! Riha min xemgîn e, dest û piyên min xemgîn in, berçavka min xemgîn e, hişê min xemgîn e, panava di navbera mal û komela SPONGAYÊ xemgîn e. Kila vê şevê ya ku daye pey çavên ji kildanka giyanê min derçûye. Şax û çequlên vê cîhanê ên ku di matmayîna pirsên te hişk dibin, ji daristana taristana canê min derdîçin.

De wan çûkên ku ji ber seqemê xwe sipartine germiyana destê te hînî hêlînan bik!!

De serê min jî li ser sînga xwe hînî balgehên perîkî bik!!

De vê xemgîniyê mîna girtiyekî hînî berdanê û derîkî bik!!



# Kultur û Qabiliyet

Riza Polat

## Ferd û Civak

**D**i pirsên ferd û civaki de her roj munaqşeyên nû rû didin û munaqşe bi pirsgirêkên nuh didomin. Ew kesên ku di pirsên ferd û civakê de munaqşeyên kûr vekirine û berhemên dagirtî dane, sosyolog û filozofên Awrupa Xerbi ne. Mixabin di warê pirsên ferd û civakê de gotin û nivîsandinên marksîyan pirr kêr in. Marks, Engels û Lenin car carna û pirr kêr in.

Helwestên alimên Marksî di pirsên ferd û civakê de li ser esase nêrîna çinayeti bûn û ew nerîn jî nerîneke pirr gelemperî ye, nerîneke weha sathî nikare jiyan daxwaz û interesên ferdîyatîya ku îro pêşketî îzah bike. Ferd bi kîjan dînî bawer be yan jî nerînên wî yên siyasî çawan bin bila bibin dîsa jî nayê wê manê ku xusûsiyetên, wî yên wekî kesên ku ji eynî dînî yan jî ji eynî bawerîya siyasî ne. Mirov nikare ferd bi xwestin, fentazî û interesên wî, wî li gora çîn, tebeqa û li netewaya ji hev biqetîne. Pir kes dikarin bi eynî dînî bawer bin yan jî di eynî bawerîya siyasî de bin, lê xwediyên ferdî û şexsî pir jî hev cuda bin.

Wek me li jor jî bahs kir, tesbît û nivîsandinên alimên Marksî li ser bingeha çinayeti û iqtisadîyê bû. Ji ber wê jî di warê ferd, civak û ilmên civakî de pir qels man. Heta mirov dikare bêje ku di nivîsandin û analîzên ilmên civakî de berhemên alimên Marksî ne girên biçûk in jî. Di nav camêa sosyologên dinê de alimên Marksî pir zeif in. Lê qala nivîsandina me ne munaqşe û analîzkirina berhemên camîa sosyologên Marksî ne. Behsa wê nivîsandinê ew e ku gelo pêwendîya di navbera ferd û civakê de peywendîyeke çawa ye? Munaqşe ku ferd berî civakê tê yan jî civak berî ferdê tê wek munaqşe mirîşk jî hêkê dertê yan jî hêk jî mirîşkê dertê ye. Mirov wê pirsê wek pirsê mantiqî yan jî wek pirsê dîroki jî bihesibîne bersîveke ku li dij yan jî bersîveke ku her kes pê iqna be û ji

her kesî re maqûl bê nayê dayîn. Ji ber wê yekê jî mirov encax dikare bibêje civak û ferd jî hev nayên cuda kirin û nayên veqetandin. Du unsurên ku ne li dijî hev in, du unsurên ku hev temam dikin bi hev re hatine girêdan û ji bo hev pêwîst tin. Gotineke Jojn Donne ya meşhur heye "Tu kes di hundirê xwe de ne giraveke temam e, her kes perçeyeke qitayê ye û qismek jî dinyayê ye".

Roja ku mirov çêdibe dinyaya mirov, wî ji unsureke biyolojîk

Ku mirov li jiyana û muhawelên xwe binêre, mirov dibîne ku hereket û daxwazên wî girêdayî hebûna hinek mirovên din in. Tiştên ku mirov li xwe dike, teknîka ku bi kar tîne, tiştên ku mirov dixwîne, dibîne yan jî dibihîze û tiştên ku mirov dixwe berhemên hinek kesên din in. Mirov ji qismek pir jî zanîn, fêrbûn, baweriyên dînî, siyasî û civakî jî kesên xeyrî xwe û bi riya zimaneke distîne. Ku ziman tunebûna qapasîta aqilê mirov ya ku îro mirov bi wê harîqa îcat dike wê derecê pêşketî nebûya.

Roja ku mirov hatiye ser rûyê dinyayê, heke bi serê xwe bijîya wê bi hisker û hisên xwe pir paşdemayî bûya. Çûnkî jî dayikbûna wî re tu fazîlet û xusûsiyetekê zanistî tune. Ji ber wê yekê jî li cem jiyana jî civakê derwê kultur û zanîneke bilind durust nebûya. Zanîn, kultur, exlak û bawerîya ku li cem zarokê deh û danzde salî, yan jî li cem mirovekî sîh û çel salî ne tenê ya van salan e. Ew kultur, rabûn û rûniştin, exlaqê ku cem van şexsî girtiye, ya sedsalan û hezar salane. Roja ku mirov dest bi tîgehîştin û bi axaftinê dike, mirov jî bab û kalê xwe tiştên ku ewan jî jî bab û kalên xwe bihistine û ji van fêrbûne digre.

Mirov wek ferd jî çî demê bi xwe hesîya û xwe nas kir?

Beriya Ronensansê ferd tenê xwe wek mensubê qewmekî, gelekî, partiyekê, malbatekê yan jî mensubê lonçayekê nas dikir. Lê bi Ronensansê ve fam kir ku xwediyê rehekê ye, xwediyê bîr û baweriyekê û xwediyê şexsiyeteke ye. Ji ber wê jî mirov dikare bêje şoreşa Firansayê û îlankirna mafê mirovayetiye û hemwelatiyê di eslê xwe de mafên ferdî û ferdîyatiye bûn.

Ferdîyatiyeke pêşketî, xurt û bi kultur di pêşketina civakê de roleke pir alî dilîze. Di civak, li welat û di partî û dezgehan de hebûna ferd û ferdîyatiyeke azad, roleke pêşketî dilîze. Piraniya serkirdayetiyan welatan, partiyan û muesesan naxwazîna di wan deran de ferd û ferdîyatiyeke pêşketî û xurt hebe. Çûnkî hebûna ferd û şexsiyeteke xurt jî bo wan kesên unsûreke bi tehlike ye. Hedefên wan serkirdayetiyan ew e ku mirovan di bin seytera xwe de bê ferdîyet û bê şexsiyet bihêlin. Wan bikin mirovên ku pirsan nakin, rexnan nagrin ji her biryar û îcreat û kirinên wan re serê xwe xwar dikin. Ji bo serkirdayeteke totalîter û diktator, hedef her tim ew e ku ruh, mêjû û fikirandina mirov bitemirîne û rê li pêşîya ferd û ferdîyatiyeke pêşketî, mutişebûs û muhasebekar bigre.....

**Beriya Ronensansê ferd tenê xwe wek mensubê qewmekî, malbatekê yan jî mensubê lonçayekê nas dikir. Lê bi Ronensansê ve fam kir ku xwediyê rehekê ye, xwediyê bîr û baweriyekê û xwediyê şexsiyeteke ye. Ji ber wê jî mirov dikare bêje şoreşa Fransayê û îlankirna mafê mirovayetiye û hemwelatiyê di eslê xwe de mafên ferdî û ferdîyatiye bûn.**

derdixe û dike unsûreke civakî. Mirov di kîjan dema dîroki û di kîjan civakê de hatibe dinyê der û dor û çivaka mirov ya di wê demê de şikleki, qalibekî û zimaneke dide wî. Zimanê ku mirov bikartî ne ji irsiyeta wî nayê. Zimanê ku mirov bi kar tîne ye wê grûb û derdorê ye ku mirov têde mezin bûye.

Ziman û derdora mirov di xweifadekirinê de du unsurên bingehîn in. Mirov fikrên pêşiyê jî kesên derdora xwe digre. Wek hatiye gotin "ferdê ku ji civakê cuda hem wê bê ziman û hem jî wê bê aqil bûya".

Antropolog dibêjin, insanê pirîmîtîf jî insanên pêşketîtir kêmtir "ferd e" û jî aliye civakê de pirtir hatiye qalibkirin û şexsî girtiye. Li gorî civakeke pir pêşketî û tevlihev, civakeke basît di çêkirina hinek tiştan, bi destxistina hinek qabiliyetan û diamadekirina hinek îmkanan de pirr bi yek şexlî ye. Li ser wê bingehê mirov dikare bêje ferdê civakê modern û pêşketî berhemêke civakî ya zarurî ye û di civakê de xwediyê roleke girane jî.

Lê ev nayê wê manê, ku di yekîtiya di navbera ferd û mezînbûna civakê de dijayeti heye. Pêşketina civakê û ya ferd bi hev re dimeşin û şexlî didin hev. Pêwendîya di navbera ferd û civakeke modern û pêşketî de pir tevlihev e û pir bi hev re girêdayiye.




## Weşanên Nuh



Mihemedê Mele Ehmed, Xoybûn, Civata Serxwebûna Kurdî (1927-1946), Weşanên Kovara Zanîna, 1993, Qamişli, 151 rûpel, Kurmancî, Wergera ji Erebi: Keça Kurd

Mihemedê Mela Ehmed ji Qamişliyê ye. Wî ev kitêba xwe pêşî bi Erebi nivîsiye û çap kirîye, Keça Kurd jî ew jî erebi wergerandiye Kurdî. Kitêb li ser dewra Kurdên Osmanî û piştî re bi taybetî le ser dewra avabûna Xoybûnê û xebata wê ye. Her weha tê de behsa xebatên berî salên 30 û 40 yê li Sûriyê jî dike. Kitêb jî bo kesên ku bixwazin lêkolînekê li ser tarîxa siyasî ya Kurdîstana Sûriyê û Xoybûnê bikin, çavkanîyeke heja ye. Mihemedê Mela Ehmed, her weha bi navê "Sefahat Min Tarîx Hereket ul Tahîrî el Weterî el Kurdîyê fi Sûriyê" kitêbeke din jî derxistiye.



Dr. Celîlê Celîl, Kurdekani Împiratoriyeti Usmanî, Baxdad, 1987, 326 rûpel, (Sorani)

Dr. Kawus Qeftan le rûsiyewe kirdûye be kurdî û pêşketî û perawezî bo nûsiwe.

Ev xebata Celîlê Celîl cara pêşî di 1973an de bi rûsî derketiye. Dr. Kawus Qeftan jî li gel hin notên binî û pêşgotinekê ew wergerandiye Kurdî (Sorani) û çapkirîye. Tirkîya wê jî bi navê "XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler" jî teref Mehmet Demîr ve jî rûsî hatiye wergerandin û di 1992an de di nav weşanên Öz-Ge de hatiye çapkirin.



Selman Osman (Konê Reş), El-Emîr Celadet Bedirxan, Şam, 1992, 173 rûpel, Erebi.

Selman Osman (Konê Reş) nivîskarekî jî Kurdistan Sûriyê ye. Wî demekê li Qamişliyê kovara Gurzek Gul derxistiye. Di gelek kovar û rojnameyên Kurdan û Erebana de nivîs û lêkolînên wî derketine. Lê xebata wî ya herî heja û barbiçavê bî guman kitêba wî ya li ser Celadet Bedirxan e. Li gor gotina wî, wî pêşî kitêba xwe bi Kurdî nivîsiye, lê jî ber şertên Sûriyê, jî mecbûrî ew wergerandiye Erebi û çap kirîye.

Wî ev kitêba xwe ya ku li ser Celadet Bedirxan e, bi piraniyê bi alîkariya Rewşen Bedirxanê nivîsiye. Kitêb jî çend beşan pêk hatiye. Di destpêkê de behsa malbata Bedirxaniyan dike, piştî re bi kurtî xebat û jiyana Emîn Alî Bedirxan, û paştî êdî bi dîr û dirêjî behsa jiyana û xebat û bîr û ramanên Celadet Bedirxan û kovarên Ronahî, Hawar û Roja nû dike. Her weha di kitêbê de gelek belge û rismên heja yê Bedirxanî û Kurdên wê demê hene. Di demek nêzîk de Kurdîya wê jî wê derkeve.



Heyder Umer, Feqîyê Teyran, Lubnan, 1993, 131 rûpel, Erebi

Ev kitêba duwemîn a Heyder Umer e ku bi Erebi derdikeve. Ya pêşî jî li ser Ahmedê Xanî bû. Heyder Umer ji Afirînê ye, mamostayê lîseyê ye. Ew di wê xebata xwe ya li ser Feqîyê Teyran de, bi taybetî li ser naveroka helbestên wî, jiyana û navê Feqîyê Teyran diweste. Mesela nêrînek wî ew e ku navê Feqîyê Teyran neku jî Teyran lê jî Tiran hatiye. Nivîskar jî gelek çavkanîyên Erebi, Kurdî (Kurmancî-Sorani), Îngilîzî jî feyde wergirtiye û di dawîya kitêba xwe de wek çavkanî navên wan jî nivîsiye.



Îsmet Seyda, Mistek Azar (helbest), Suriye, 1992(?), 95 rûpel, Kurmancî

Îsmet Seyda yek ji kadîrên siyasî yê Kurdên Sûriyê ye. Di salên pênciyî de ketiye nav refên xebata gelê Kurdistan Sûriyê. Pêşî di Partîya Demokrata a Kurd de kar dike, piştî 1965an ku partî dibe du beş, ew ligel çepan dimîne, di 1969an de dibe endamê komîta navendî ya partîyê. Di 1975an de jî dibe sekreterê Partîya Çepê Kurdî Li Sûriyê. Îsmetê Seyda di 1989an de wêfat kirîye.

Di vî dîwana wî de 47 helbestên welatevîni hene. Brahîm Yûsîf û Ebdulhefîz Ebdurrehman jî jê re pêşgotin nivîsiye.



Amadekar: M. Pakdemir

# CINÎYEKA GEJ

Seyîdxan KURIJ

**C**êyk benû cêyk nibenû, yo cinîyeka gej û miyerdê yay benî. Miyerik ruejêk cinîyê xwi ra vûnû:

-Cinîyek, inî lay ma ber bidi çulag wa çulag ma rî şapikûn virazû.

Cinîyek la gena şina ver yo dêrî. Miyûn owki di qirînceliyê vînçnenî. Cinîyek xwi bi xwi fikirîyena vûna "Temûm, qirînceliye hey vûnî la bidi ma, ma şalûn vira-zenî" û lay xwi erzena zerrê owk, vûna:

-Ez lay dûna şima, la şima zerrê yo heftî di virazenî. Yo hefte cuwa pê ez yena şapikûn bena!

Qirînceliyê hûncî vînçnenî, ya vûna "Temûm, yîn qewul kerd" û tepîya gêrena a, şina kiye.

Miyerik vûnû:  
-Cinîyek, tû la pê se ker-di?

Ya vûna:  
-Mi la berdi da çulag, yo hefte cuwa pê ez şina şapikûn ûna.

Yo heşt qediyenû, ya hûncî şina ver dêrî. Qirînceliyê gueli di vînçnenî, ya vûna:

-Şima şapikî viraşt niyûn niye?

Qirînceliyê vînçnenî. Ya owca di pawena, şal-malî nîni. Teselê yay kuwena xwi erzena miyûnî gueli. Gueli di gêrena, bin gueli di yo topa altunîn vîna. Gêrena a, het qirînceliyûna, vûna:

-Ox, mi çim şima vetî, mi terazî şima gureti, şima êr ra tepîya pê çinay a lay sen-çenî?

Top gena, şina kiye, miyerdê xwi ra vûna:

-Çulagûn şal mi nidayî. Mi zî ina terazî yin tê ardi.

Miyerik senî gi çim ginenû top, ca di zûnû ki topa altunîn a. Wi top yay ra genû, kiye di nûnû rue.

Ruejêk miyerik kiye di nibenû, yo 'etarîyecî yenû. Cinîyek top ûna muecniyena 'etarîyecî, vûna:

-Ez ina top bidi tu ti çinay dûnî mi?

'Etarîyecî tolax xwi piyer dûnû ci, top ti ra genû.

Ya ûna diyesûn kîyî ya mîxûn kuwena, çî 'etarîyecî diyesûn a kena dar di. Diyesûn pê çî 'etarîya ya xemil-vena.

Şûn di miyerdê yay yenû kiye. Ya şina ver a, yi ra vûna:

-Miyerik, dêst xwi dêst mi

kiri, ma kê xwi siyer bikiri-mi.

Miyerik uniyenû diyês piyeri pê gilarzûn çî ya xemili-yayî. Miyerdê yay vûnû:

-Ini çî û?

Cinîyek vûna:  
-Miyerik mi aya top da yo 'etarîyecî, mi ini çî piyer yî ra gureti.

Miyerik yay kuwenû, erzenû teber. Cinîyek şina tebêr dewi di nişena rue û bermena.

Owca di binê vindena, o hayi di weta yo devaya barkêrdî yena. Deva yena yay ver, vindena, mil xwi kena çot kena raşt; cinîyek vûna:

-Waka milçot, kerdinê eyi kutikbav zaf ê; ez niûmên la qay xatir tu ya ez yena.

Û deva zî gena şina.  
Şina ver ber, vanda miyer-dê xwi dûna:

-Miyerik, biye biye! Ez niûmên la qay xatir ina waka milçot a ez ameya.

Miyerik uniyenû ki yo deva barkêrdî hûnî ya ver berî d' a. Wi ca di şinû bêr kenû a, yini genû zerre. Cinîyê xwi ra vûnû:

-Cinîyek, biye ma êr zewi-ciyenî.

Miyerik kincûn rindûn dûnû cinîyeki ra û yay kenû zerrê 'embar. Yo tepsîya asinîn sêr 'embar a nûnû rue û tûn qut kenû zerrê tepsî; çend kergûn erzenû sêr 'embar. Kêrg nequr dûnî qutî ri, veng şinû cinîyek, ya vûna:

-Miyerik o çî veng û?

Miyerik vûnû:  
-Cinîyek, veng xwi meve-ci! Tuerga asinîn ha varena, ti teber mevêci.

Û cinîyek owca di ver-denû, şinû bar deva nûnû rue. Bar deva piyer altun î. Wi yo çal kenênû, ini altunûn kenû çal û herri dûnû ser.

\* \* \*

Ma cinîyek û miyerdê yay owca di verdîmi, ti nivûnî deva devay yo mîr a. Mîr delal dûnû vendayîş, gêrenû devay xwi. Cinîyek sinî veng delal eşnawena, ca di şina kê Mîr, vûna:

-Deva hûnî ya kê ma d' a.

Merdîm Mîr pa cinîyek a yenî kê yin, miyerdê yay ra persênî, miyerdê yay vûnû:

-Ma taway deva nidîya.

Ya vûna:

-Mi deva tebêr dewi di dî,

mi guret tê ardi kiye.

Yi cinîyek ra persênî vûnî:

-Tû kûm waxti di ina deva tê ardi kiye?

Cinîyek vûna:

-A rueja ki ez biya vev, tuerga asinîn varayin, a ruej mi deva pa bar ra ardi kiye.

Miyerik vûnû:

-Ina sêfek a, taway nizûna. Emser no-des sêr o ma zewiciyayî. Çî ray şima eşnawit tuerga asinîn v-ayaya? Taway inayin çinû, mi deva-meva nidîya.

Merdîm Mîr miyerik benî erzenî hefsxûne. Wi cinîyê xwi ra vûnû:

-Cinîyek, wahar kîyî vecî, miqat berûn û pencirûn bi.

\* \* \*

Xêlîyek zemûn bînate ra veriyenû, ruejêk cinîyek wazena şuerû miyerdê xwi vînu. Qalê miyerdê yay yena vîrî, wirzena ber û pencirûn kena we, tê bena.

Miyerik vûnû:

-Mi şima ra va ki "Cinîyê mi geja", şima bawerê xwi mi niard. Merdim aqil ûna kenû?

Hakim vûnû:

-O qeyde o se ma yay ce-ribnenî.

Hakim û ey azay bîni mehkima, ûni yo çeng eskicûn û gûlalûn kênî tiye miyûn, cinîyek ver di şûnenî ra. Cinîyek uniyena ki gûlalê hê yî şinî la eskic hûnî vinderte ê. Ya gûlalûn dûna ariye, erzena xwi fek û xwi bi xwi vûna "Ez hê vêr inî şiyayûn burî, inî bîn hûnî vinderte ê, cay nişinî.

Miyerik vûnû:

-Mi şima ra va "Gej a", şima bawerê xwi mi niard. Ma deva-meva nidîya, xeberê ma taway ra çinîya. Mi vera diyen ez şuerî kê xwi.

Yi ûnî miyerik vera dûnî, miyerik şinû kê xwi û bar deva bin 'erd ra vecenû. Zerdûn (altunûn) û êy çî bîn xwi ri xerc kenû. Kêf kenû, xwi ri altunûn wenû.

Mi ra zur, hûmay ra raşt; mi yo taway helaw viraşt, mi cema'at ra kerdî raşt.

Jacques Prévert'î ra çend Şiîrî

## ROJO VERÎN

Çitê sipî yew dolabi miyan di  
Çitê surî yew cili miyan di  
Yew gedê pîzey maya xwi di  
Maya yê miyanê dejan di  
Piy miyanê heyati di  
Heyati miyanê banî di  
Ban miyanê şaristanî di  
Şaristan miyanê şewî di  
Merg miyanê yew qîrî di  
Û gedê miyanê heyatî di

## PAYÎZ

Yew estor ortey yew rayirê miyanê daran di keweno  
Pelê daran piro rişenî  
Heskerdişê ma recifiyêno  
Roj zî.

Frensizkî ra tadayox: **Bengin ROŞN**

## VA YENO VAYÊ KOYAN O

Va yeno vayê koyan o  
War keno xîncê banano  
Vay dano porr û piskano  
Rişneno pelê darano  
Leqnenî zerbey berano  
Rojawan o, roj[h]elato  
Şewqê to dawo welato.....\*

Na deyîri heway vatişê yew Dêreyîjî nusiyaya û nêmcet a. (Dêrey yew dewa qezay Piranî ya.

## LAWIKA USÊ SEYDALÎ

Se kerî, se kerî, ardê mi qediyayî,  
domanê mi vêsan ê, ez se bikerî?  
Rojê, di rojî niyo  
dang û bulxûr a bas kerî;  
sewê, di sewî niyo  
der û cîranî ya dêyn kerî;  
serre, di serrî niyo  
sarî rê moravayênî bikerî.

Se kerî, se kerî, ardê mi qediyayî  
domanê mi vêsan ê, ez se bikerî?

Xurrên kota derûnê usarî,  
domanê mi merdî, qediyayî;  
çikênî kemerû nêkuna,  
destûnê mi de koyî poyayî.

Se kerî, se kerî, ardê mi qediyayî,  
domanê mi merdî, ez se bikerî?\*

\*Biewnî Roja Welat, Ankara, no: 2 (30. 10. 1977), r. 15

## Uzra ji qebebetê....

Destpêk: r. 4

bi ziman, bi kultur, bi psîkolojiya xwe jî dibe Tirk. A Tirkbûna herî xerab jî ev e, çimkî êdî vegeer zahmet e. Di peydabûna netîceyêke wiha trajîk de li gel siyaseta dewletê, siyaseta me jî roleke mezin listiye û hîn jî dilîze. Ya din jî, jî bo "bîrûraya Tirkîyê" ne rast e ku em bi zimanê xwe nenivîsin. Ma Filistinî jî bo şiyarkirina bîrûraya Îsraîl hemû weşanên xwe bi Îbranî derdixin, dev jî zimanê xwe berdane? Bi ya min, em karê polisê Tirk hêsan dikin û hewqas. Bira jî xwe re tercumanên Kurd bigrin...

Piraniya me di bin tesîra kemalîzmê de ye, em zimanê xwe biçûk dibînin. Rastî ne wiha ye. Gava em îro Tirkî bi Îngilîzî ya jî bi Fransîzî re muqayese bikin, netîce wê jî bo Tirkî jî felaket be. Ma Tirkî çiqasî dikane bersîva hewcedariyên tîbbê, huqûqê û teknîkê bide? Gelo gotinên di van qadan de tîn bikaranîn çiqasên wan bi Tirkî ne? Ji ber ku Tirkî di van qadan de zêf e kes nabêje em bi Tirkî nenivîsin. Îro li dinyayê bi sedan millet hene ku zimanên wan jî zimanê me ne dewlemendtir in, lê cardin jî bi zimanên xwe dinivîsin. Ma Tacîkî, Azerî, Ozbekî û gelek zimanên wek wan qey jî Kurdî pirr dewlemendtir in?

Ji mustewa Kurdan a xwendin û nivîsandinê gazin tê kirin. Rast e, kêr Kurdî dikane bi zimanê xwe bixwîne û binivîsîne. Viya ne keşfê ne hê, herkes pê dizane. Ya muhîm ne tekrarkirina vê realîte ye; çare ye, çare? Ji bo guherandina vê "realîte" divê em çî bikin? Çare û tedbirên jî bo îro, ne jî bo axîretê.

Ez fahm nakim merivêkî sosyalîst, welatperwer çawa dikane bibêje, "em dikanin weşaneke bi Kurdî derxin, lê em dermaxin". Ew kesê wiha bibêje mana xwe ewe ku ew hîn nizane ew jî bo çî xebatê dike... Heger tu yê bikanîbî û tu yê nekî, ê birader, wê gavê tu çî dixwazî? Ma tu mafekî ku meriv berî rizgarkirina axê bi dest xe tune-ye?

Berê me digot dewlet nahêle, lê nuha dihêle îcar em dibêjin na, em naxwazin. Wer xuyaye asimilasyonê mejiyê me îşxal kiriye, lê haya me jî ji me tune ye. Ez bawer dikim heger sibe dewleta Tirk, Tirkî li me yasax bike wê jî nav me bi sedhezaran însan serî hildin, wê jî yasaxkirina Kurdî bêtir li hember a Tirkî derkevin. Realîta Kurdan îro ev e. Divê hîn ku dereng nebûye em wek millet ariyakê li serê xwe kin...

## Li Kurdistanê ....

kanîna wê û him jî bêmu- daxelaya polis û leşker nîşan dide ku bûyer berê hatiye organîzekirin û dewlet van kesan teşwîkê bûyarê kiriye. Bi vî bûyarê dewlet xwest ku bala raya giştî li ser bûyarên Kurdistanê vekîşîne û fitnê dijminatîyê têxe navbera Elewîyan û Musulmanên Sûnî.

Du rojan piştî bûyera Sêwasê îcar li gundekî Erzîncanê; Başbaxlarê qetliameke din çêbû. Ev gund gundê Misilmanê Sunnî bû. Wexta nimêja êvarê, gundî jî camiyê der-xistin anîn meydana gund û ew gulebaran kirin 28 gundiyên Sûnî hatin kuştin. Dewletê wek her gav ev bûyer jî xist hustiyê PKK'ê. PKK jî ne li bûyerê xwedî derket û ne jî ew rûş kir.

Di 19'ê Tîrmehê de li qezaya Wanê, Baxşeserayê li Zozanê Sûndiz 26 qoçer bi

ser hev de hatin qetilkirin. Ji van 26 kesan 15 zarok û 9 jin bûn. Lê ev bûyer tavi- lê derket holê ku hêzên tarî yê dewletê ev bûyer çêkirine. PKK'ê got ev bûyer jî aliyê Kontr-gerilla we hatiye çêkirin. DEP'ê jî ev bûyer rûş kir. Lê dîsa dewletê bi medyaya xwe ev bûyer xist hustiyê PKK'ê.

### Zihniyet muhîm e, ne cînsiyet

Di dîroka Tirkîyê de cara yekem e ku jinek dibe serokwezîra Tirkîyê. Ew jî berî çendekî bi serokkomariya Demirel, Tansû Çiller di Kongreya DYP'ê (Partiya Rêya Rast) de bû seroka Partiyê û otomatîk bû serokwezîr jî. Piştî avakirina hukûmeta koalîsyona

duyem ya DYP û SHP'ê, çî di programa hukûmetê de û çî jî di beyanên Tansû Çiller de siyaseta wan a li hember mesela Kurdî wê wek berê be. Yanî mesela Kurdan hewaleyî eskeriyê dikin.

Piştî gera serokwezîr û wezîrên hukûmeta Tirkîyê li Kurdistanê û civîna hukûmetê li Çolamergê û axatîna Tansû Çiller û Erdal Inonu li Çolamergê, li Şernaxê û li Diyarbekirê nîşan dan ku dîsa jî Kurdan re tiştê nîne, ew diwaxzin pîrsa Kurdî bi "pêşdaxistina aborîyê" li herêmê çareser bikin.

Ji xwe hukûmet bi dirêj- kirina mudeta wezîfa Serokê Erkanî Herb Dogan Gureş da xwiyakirin ku wê mesela Kurdan bi darê zorê "hel" bikin.

Lewend Fîrat

## "Daxwaza me ew e ku zimanê..."

Kurdistanê pêşkêşî me dike em fexr û şanazyê pê dikin û em jî berdewam piştevaniya xwe bo rêbaz û bo armancên vê partiyê diy- ar dikin. Lê dergehê yekîtiya me jî her kesekî re vekirî ye. Çî Partî be an jî çî partiyeka din be dergeh jî her kesekî re vekirî ye ku bibin endamên kamîl û di nav yekîtiyê de cîh bigrin. Bi wî şertê ku rêbaz û pro- grama yekîtiyê qebûl bikin û baweriya wan pê hebe. Em dişên bêjin ku xebata yekîtiya me, Yekîtiya Q.L.D.K. di 39 salên bûrî da berxwedanek an nêrîneke baş ji millet distîne. Di rapêrîna 1991'an de jî Yekîtiya me bi gelê xwe re bû. Gêl bi çavekî baş li me dinêre. Lê li vir em daxwazê ji hemû partî û rêkxistinên Kurdistanê başûr dikin ku meselên xwe yê siyasî bîdine layekî, fikrên siyasî çî dibin bila bibin, divê her kesek piştgir be ji bo berde- wambûna yekîtiya me.

**Armanç: Mercên endametiye bo yekîtiya we çî ne?**

T. Germavî : Merc bo her Kurdekî xwendekar ku sinifa 6 a seretayî (xwendîngeha yekem) temam kiribe û dest bi xwendina navendî kiribe, mafê wî/wê

heye ku bibe endamê/a yekîtiya me. Herweha her xwendekarek piştî xwendina xwe bi du salan jî maf heye ku wek endamê/a yekîtiya me bimîne. Xwendevanên ku temenê wan jî 14 salan piçûktir û jî 35 salan jî mezintir nebe, dikarin bibin endamên yekîtiya me. Digel vê jî divê endam Kurd bin û hisên wan ên Kurde- warî hebin û pêrew û pro- grama yekîtiyê qebûl bikin û endametiya xwe ya yekîtiyê bidin.

**Armanç: Daxwazên we ji xwendekaran çî ne?**

T. Germavî : Em dix- wazin xwendekarên me yê delal li Kurdistanê azad wekî xwendekarên dinyayê bi maf, daxwaz û armanç û hêviyên xwe şad bibin û her xwendekarekî Kurdistanê li gora daxwaz û şiyana xwe xwendinxaneyê xwe hilbijêre û bê asteng xwen- dina xwe bibe serî. Daxwa- za me ew e ku zimanê Kurdî li hemû xwendinxan- neyan bibe zimanê xwendî- nê. Ji bo vê jî em dizanin ku îstîfraqek li welat pêwîst e.

**Armanç: Ez dixwazim li ser rewşa zimanê pîrsêkê bikim. Ji bo zimanekî yekgirtî**

û alfabeke yekgirtî dîtînen we çî ne?

T. Germavî : Ev me- sela pîrsê giran e û bi germî îro li Kurdistanê qala vê meselê tê kirin. Bê guman hebûna alfabe û zaravayên cuda astengê e li pêşiya me û divê em çareyekê jê re bibînin. Lê wext û xebatek dirêj jê re pêwîst e. Ji nuha em jî hemû mamoste, ro- nakbîr, zimanzanan daxwaz dikin ku di vî warî de dest bi xebatê bikin û Kurdistana başûr ya azad ji wan re bîngeheke baş e û xwendin- xaneyên me hene ku bi- karibin xebata ji bo alfabe û zimanekî yekgirtî xebata xwe bikin. Me gelek xebat kiriye ku îsal li seranserê Kurdistanê xwendina Kurdî pêk bê û em jî bo vê yekê bûne pal û pişt û me dax- waz ji Wezareta Perwerde- kirinê kiriye ku li herema Kurdistanê ev mesele pêk bê.

Ji bo mesela bikaranîna tîpên Latînî jî ez dixwazim im ku tîpên Latînî nûke li xwendîngeha seretayî dest pê bike li seranserê Kurdistanê ku bo demên pêş piç bi piç zanîn, xwendin û nivîsîna Latînî pêşve biçê ku ev tîpên he baştirîn tîp in bo xwendin û nivîsîna zimanê Kurdî.

## Xaçpîrs

### Amadekar: S. Rêving

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												
11												
12												

### ÇEPELAST:

1a) Nivîskarekî bi nav û deng e, li Meksîkoyê di 1914'an de hatiye dinê, di 1990'î de xelata Nobel a edebiyatê girtiye. 2-a) Rih, kok. b) Paytextê Sûriyê c) Mukemmel, armançên pîroz ku mirov dixwaze bigihîyê. 3-a) Adar. b) Herfa "a" bikeve navbera wan dibe "yar". 4-a) Şên, ne xopan. b) Navê kevin ê bajarê Mûsilê. 5-a) Aletekî mûsîqî yê Kurdî b) Awa, celeb, cûr. 6-a) Balam, feqet. c) Sembola maddeya teqandî- nê 7-a) Dêm, wecih. b) Di destana Mem û Zînê de kesên ku ji rengê ebayên xwe tînen nasîn. c) Gemin lê tî hêran. 8-a) Qehir, acizî, kîn

(berevajî) b) Demek ji salê ku dikeve dawiya zivistanê û destpêka bi- harê û giya cara pêşî şîn dibe. 9-a) Derewîn, virker. b) Esîr, ixsîr (berevajî) 10-a) Herfa "a" têkeve navberê dibe "ban". b) Li Swêdê şirketa firokeyan ya herî mezin. c) cih, cîga. 11-a) Pronavek b) Mêrê xuşka yekî c) aletekî kolnê 12- Di baweriya zeredestîyan de Xwedayê qenciye.

### SEREJÊR:

1-a) Aletekî muzîkê b- Mêrê diya mirov. 2-a) Ji alifê dewaran b+ Di alfabe ya latînî ya Kurdî de herfa yekem û ya yanzdehem c) Zikê de- waran d) hejmarek 3-a) Heysiye, heya, şeref b)

Pronavekî îşaretê. c) Tayek ji porê mirov 4-a) Kesê li ber aş dimîne b) Li devera Botan û Şirnexê gopale ku hesi- nekî tuj li binî bizmar ki- riye. (berevajî) 5-a) Da- fik, xefik (berevajî) b) Li ba Kurdan pîvaneke wezinandinê. c) Kul, elem, êş (berevajî) 6-a) Di îslamê de bawerî b) Herfa "v" dikeve navberê, dibe "êva". c) Li met- bexan mirov xwerinê li ser dixwe (berevajî) 7-a) Ne ruhn (berevajî) b) Hestiyekî ji laşê paz ku li Kurdistanê listika kab- anê pê dilîzin. (berevajî) c) Vexwarina serekî (berevajî) 8-a) Pişmil, navê cihekî ji laşê mi- rov. b) Balon, pîfdank c) Cûrekî musikê. 9-a) Evîndarê dilperitî. (berevajî) b) Herfa "i" tê- keve navberê, dibe "zi". 10-a) Li rojavayê Îranê bajarek (berevajî) b) Eşîr. c) nexweşiyek 11-a) Paytextê Ermenis- tanê (berevajî) 12-a) Peyva pêşî ya di tele- fonê de tî gotin. b) Kesê ji destê, ne çiyayî c) Roj.

### Lêbûrîn

Ji ber çewtiyên çapê yê di xaç- pîrsa hijmara 138 ya Armançê de, em daxwaza lêbûrî- nê jî xwendevanên xwe dikin.


### Rizgar (Hêvî Yildiz)

#### û 17 tîkoşerên azadiyê

Hûn di vî şerê li dijî dijminê kolonyalîst de şehîd bûn. We bi tîkoşîna xwe rûmet da jiyane.

Tîkoşîna we ya me ye. Hûnê di tîkoşîna de bijîn.

Giyasettin Yildiz



# Piling, Şêrhat û Şêrwan

Serdar Dicle

Di salên 1980'î de bi hezaran, welatparêzên bakûr xwe bera bin xetê dan.

Kurdên binxetê bi dil û rihekî welatparêziyeke mezin himbêz û deriyê xwe ji wan re vekirin.

Xweşbûn û xirabîya civat û xweristê belkî tevlihevûna wan e. Tu tiştek sedî-sed baş û ne ji xerab heye. Di her tiştekî baş de xerabiyek an kêmasiyek û her tiştekî xerab ji xwedî başbûn û xirabiyekî ye, bi gotinek din sedî-sed reş û sedî-sed sipî tune.

Wek tê gotin "cihê av lê hebe, wê herî jî hebe". Tê wê mana ku mirov pêwîste di nêrînan xwe yên polîtîk de bi biryar, lê ne fanatîk be. Ji bîr neke û netirse ku xwedî heqê şaşbûnê ye jî.

Bi gotina dawî herkes hemfikir e ku dev ji berdana welêt ne di cihê xwe de bû. Bes rastiyek e ku Kurdên bakûr bi naskirina însên û perçên welatê xwe yên din, bêtir nêzîkî Kurdaye-

ji heye "Şêr Şêre, çî Jin e, çî Mê re" Wekheviya jin û mêr dixwaze diyar bike. Lê dîsa însên dişibîne heywana. Bêtir jî şêr in û piling.

Şêr û Piling çine û xwedî kijan xususiyetan in?

Herdu heywan jî bi xurtbûna xwe tînan naskirin, ên van nawan li xwe û zarokên xwe dikin, dixwazin mîrxasiya xwe nîşan bidin. Lê xurtbûn û mîrxasiyêke çawa? Mîrxasî û xurtbûna Şêr û Piling ne di serê wan de, lê di laşê wan de ye. Êrîşê heywanê jî xwe zihîftir dikin, wan dikujin û her weha jiyana xwe didomînin. Parastin, ked û xebateke dirêj û bi sebir li cem wan nîne.

Dikare bê gotin ku her çar dewletên ku welatê me bi zorê di nav xwe de parvekirine û ew dewletên ku li ser piştê gel û welatên din dijîn wek şêr û pilingan in. Ji dêvla diranên gir û tûj û pencên xurt xwedî polis, ordî û

çek in. Bi vê qeweta xwe çav bera hebûn û dewlemendiya gelê jî xwe zeiftir didin, li ser ked, xebat û he-qê wan dijîn.

Ji her insanî ne mûmkune yek kar bê xwestin. Di dîroka de mînakek tune ya temama mirovê civakê bi yek karî mijûl bûye. Kurd

ji weha ne. Ji bo azadî û rizgariya welatê xwe, ji bo jiyaneke bi rûmet her Kurdek lazim e barekî deyne ser milê xwe. Yek dikare şêr bike, yê din dikare binivîsîne, yekî din dikare polîtîka bike, resima çêbike, helbesta binivîsîne, ziman, dîrok-nas be... Gerek e kes gazinca neke ku, ka çima herkes naşibe wî? Lê kê çî ji xwe re hîlbijartibe pêwîst e îxanetê bi karê xwe neke. Ne xwe û ne jî hevalê xwe, der û dora xwe bixapîne.

Piling, Şêrwan, Şêrhat...Navên şerkaran in. Têkoşer in. Ciyê wan çiya, gund û bajarên Kurdistanê ye. Gel û têkoşîna hilma (nefes) wan e. Bê wan wek masiyek bê av maye, wê bifetisin. Ji wan dûrbûn û navê wan ne li hev e.

Gelo mûmkun e ku mirov him kedê biparêze, li dijî kedxwariyê raweste, tekoşerê azadî û rizgariyê jiyaneke bi rûmet be û him jî navê piling û şêra li xwe bike? Ma têkoşîna ku navê azadî û rizgariyê lê dike, ji bo çav berdana hebûn û mafê kesên din e?

Gelek caran tiştekî biçûk(!) ku mirov zêde bala xwe nadê, wek neynika psikolojiya insan e. Hundir û mêtîyê wî wek heve. Mejî û karê dike çiqasî li hev xuya dike.

Di dîroka de mînakek tune ya temama mirovê civakê bi yek karî mijûl bûye. Kurd ji wiha ne. Ji bo azadî û rizgariya welatê xwe, ji bo jiyaneke bi rûmet her Kurdek lazim e barekî deyne ser milê xwe. Yek dikare şêr bike, yê din dikare binivîsîne, yekî din dikare polîtîka bike, resima çêbike, helbesta binivîsîne, ziman, dîrok-nas be. Gerek e kes gazinca neke ku, ka çima herkes naşibe wî? Lê kê çî ji xwe re hîlbijartibe pêwîst e îxanetê bi karê xwe neke

Bi dorê bersivê didin.

- Piling
- Şêrhat
- Şêrwan.

Kurdê binxetê pişt re ji hevalê xwe ra dibêje "Ma çima tu nabêjî em hatine nav bexçê heywana"!!?

Gelek kesan ji bo parastinaxwe nav guharandî. Ez bawer im îro îstatîstîkê çêbibe wê bê dîtîna ku ên bêtirî zû westiyên û ji tekoşîna bi dûrketin, kurmî bûn, bi dû qurîşên Ewrûpiyan ketin, hejmarê ew kesên ku xwedî navên wesa ne, tîra xwe heye. Destpêkirin navên weha li zarokan jî dikin. Bê ku haya zarok jî tiştekî hebin, tiştekî bi mîranî û mîrxasî kirin, wan dikin "Şêr û Piling" Bê ku gel ji wan re bêje, vî navî li xwe dikin. Di warê nefsbîçûkiyê de gelekî feqr in. Gotineke Kurdî

# BEROŞ



Mahmûd Lewendî

Ev çiroka ku hûnê nuha li jêrê bixwînin di hejmarê berê de nivco hatibû belavkirin. Ji ber wê yekê ez wê ji nû ve û bi temamî carek din belav dikim, êdî xwendevanên ku berê nivê wê xwendibûn, dikarin ji nivê pê de bixwînin, yên qet nexwendibin jî dikarin çavê xwe lê bigerin.

## Pakêtek Marlboro

Du hefteyên me li Sûriyê neqediya, welweleyek ket nav xelkê. Xelk û qaçaqxçiyên mezin li bin guhê hev ketin. Ew û hukmat bi hev ketin. Çar ji wan û dudu ji hukmatê hatin kuştin. Li dawîya dawîyê hukmat bi ser ket û cixare ji piyasê rabûn.

Ê min, ev nêzî bîst salan e ku ez cixarê dikşînim. Ê ez tu carî jî bê cixare nemame. Îcar bi ser de li welatekî wek Sûriyê ku rehên esebîyeta mirovî her deqqe radibin ser piyan, ger cixare jî nebe divê mirov ya xwe yan jî hinekan bikuje.

Neyselê di wê tengasiyê de me hefteyekê bi titûna qaçax a ku ji serxetê dihat îdare kir. Lê paşê ew jî bi dest me neket. A îcar nebû! Me çiqasî hewl da qet nebû, heta rişwet û bertilê jî daxî pere nekir. Wele em mecbûr man me partî kirin dewreyê.

Ji hevalan yekî telefonî partîya Hemdînê Bajarî kir, yek jî mekteb-siyasî ya partîya Hemdîn hat ba me û bi dilekî şikestî got: "ev du hefte ye ku ji tîrsa cixarê me civîna komîta merkezî li dar nexistîye, çunkî em ditirsîn ku endamên me di civînê de bi hev kevîn, cixare jî tune ye ku wan nerm bike, ji ber wê jî me civînan xwe avêtin piştî ku cixare derkevin piyasê".

Lê camêr navê hevalekî partîya Şemdîn el-Fellehî da. Me telefonî berpirsiyarekî wan kir, me west û cih tesbît kir û em li wî ciyê ku me soz dabû hev, me hevûdu dît. Camêrê ku li ser navê Partîya Şemdîn el-Fellahî hatibû, wî jî em birin ba endamekî hizbekî îştîrakî ya Sûriyê, bi wasita wî endamî me yekî Baasî dît. Wî jî got:

-Hevalekî min î "exwan" heye, belkî ew bikaribe ji we re peyde bike. Dikana wî heye, li taxa jorîn e, ka bisekinin ez telefonî wî bikim.

Camêrê me yê Baasî telefonêka xweş a erebî kir. Li şûna ku di nav deqeyekê de bibêje "cixare heye-tune ye?" camêr jî niv saetê zêdetir bi hevalê xwe yê "exwan" re suhbet kir. Piştî suhbeta erebkî ya bi telefonê, li gel Baasîyê xwe me berê xwe da dikana biraderê "exwan".

Em hatin serê kuça mîrikê exwan, hevalê Baasî li serê kuçê sekinî û bi desta dikanêke goştîroş nîşanî me da û got:

-Aha ew e, lê diqqet bikin, bila kes bi we nehese ku hûn cixarê dikirin. Ezê neyem, çimkî hevalên min ên Baasî ewê bixeyidin ku ez herim dikana yekî exwan!

Me got "baş e" û me da rê. Em hatin ber deriyê dikanê. Dêmax qey hevalê me yê Beesî ji hevalê xwe yê exwan re şikl û şemalê me tarif kirîye, çawa ku em çûn ber derî, exwanê me em naskirin. Neyselê piştî "selam û eleykum" û "eleykume selam" û "ehlen bîkum" û "keyfekum" û "halekum", mîrikê goştîroş bi çavan îşaret da me, em bi dizî ketin hundurê dikanê wî. Di dikanê de em ketin odeyeke din. Em li wê rawestîyan.

Goştîroş çû dawîya ode, ji binê laşekî ga pakêtek Marlboro derxist û da min. Min jî pênc qat zêdetir heqê wî dayê, û min cixare xist bêrika xwe û bi gelek "şukren" û "kitîr şukren" an min xatir jê xwest û em ji dikanê derketin.

Heta roja ku ez ji Sûriyê vegeryam jî, ji bo derman jî cixare li piyasê tunebûn.



### ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesên Mizgîn

◆ Bakteriya (mikroba) Escherichia (Eşerîçya) Coli (Koli) di 12 saetan de dikare 500,000 bakteriyên wek xwe bifirîne.

◆ Britanya Mezin piştî 10 000 sal îzolasyonê cardin gihîştê Ewrûpayê. Tûnela ji Calais heya Doverê 50 km dirêj e. Kolandîna tûnelê di sala 1985'an de dest pê kir û di meha çileyê pêşîn a 1993'an de wê jî bo trafikê bête vekirin.

◆ Mûcidê makîna buxarê di eslê xwe de ne James Watt e, lê Heronê yûnanî ye. Heron di sala 120 B. Z. Î de xara buxarê yan jî "aeropîl" ê dît, lê James Watt ev dîtîna pêşde bir, baştir û nûjentir kir û bu bîngeh jî bo şoreşa endustriyê.

◆ 5 milyar insanên li dinê di rojekê de bi

hevre 100 milyar caran seks dikin (bi hevûdu re radikevin) û dibin sebaba 910 000 hemlebûnan û 365 000 nexweşiyên cinsî. 150 000 jin abort dikin û ji van 150 000 jinan 500 jin di dema abortê de dimirin.

◆ Girîn alikariya mirov dike. Dema em digirîn gelek caran piştî girinê em xwe baştir hisdikin. Ji ber ku hormonên ku di dema strêse de peyda dibin, bi hêşîrên çawan derdikevin der.

◆ Li gor teoriyêke nû jiyan ne li ser erdê lê li bin erdê dest pê kiriye. Fizîkzan Thomas Gold li Universîta Cornell li DYA vê nefîceyê piştî lêkolîna xwe dide pêş. Li gor wî, pênc milyar sal berê binê erdê jî ser erdê jî bo jiyaneke mûsaftîr bûye. Ji ber ku di wê demê de ketina asteroiolan li ser dinê tîrêjen kozmîk diafirandin.

◆ Lêkolînerên Danîmarkî pozekî (bêvil) elektronikê çêkirine û bi vî pozî mirov dikare xwarinê teze û kevn jî hev veqetîne. Kristalên di sensorên poz de hatine bi cih kirin, dikarin bêhna tiştên teze û tiştên kevn jî hev veqetînin. Danîmarkî vî pozî wê pêşî ji bo goşt û masî û piştê jî ji bo xwarinê din biciribînin.